# CEZA LI MIRIYAN JÎ BIRÎN

**6'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Edeneyê, biryara ku mînaka wê tune da û li Mehmet Saît Çeçenê ku jiyana xwe dest daye bi hinceta beşdarî çalakiyê bûye û propaganda kiriye 10 meh cezayê girtîgehê birî**

Li Tirkiyeyê dadgeh ji bilî zarokan ceza li miriyan jî dibire. 6'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Edeneyê, bi dayîna 10 meh cezayê li welatiyê bi navê Mehmet Saît Çeçen ku di 28'ê hezîranê de jiyana xwe ji dest dabû, biryareke balkêş û ecêb da. Bi hinceta di tebaxa sala 2005'an de gora Endamê HPG'ê Abdullah Denîz zîyaret kirin, di 7'ê îlona sala 2005'an de ji ber beşdarî daxuyaniya şermezarkirina astengkirina meşa Gemlikê bûbûn û di 9'ê cotmeha 2005'an de beşdarî daxuyaniya çalakiya şermezarkirina derxistina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ji Sûriyeyê bibûn, der heqê 35 DEHAP'iyan de doz hatibû vekirin. Danişîna doza ku 4 sal in didome bi dawî bû. Balkêş e ku dadgehê 10 meh cezayê girtîgehê li Mehmet Saît Çeçenê ku wefat kiriye birî. Malbatê nerazîbûn nîşanî biryarê da... *RÛPEL - 5*




ROJEV

23 Mijdar - Duşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 11


## Çavê gelê kurd li Îmraliyê ye...

Careke din derket holê ku hem MHP û CHP, hem jî AKP di çarçoveya rola ji wan re hatiye dayîn de, li parlamentê tevgeriyane. Di danûstandinên li wir de, MHP û CHP'ê rola polîsê baş dane AKP'ê û niyeta rast a AKP'ê ya li hemberî pirsgirêka kurd derketiye holê...

CEMÎL BAYIK - R.2

## 300 girtiyên PYD'î di grevê de ne

Greva birçîbûnê ya 300 girtiyên endamên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) bi armanca şermezarkirina zordariyên li girtîgehan û başkirina şert û mercan di 30'ê cotmehê de dane destpêkirin kete roja 24'emîn. Hate zanîn ku Dadgeha Şamê ya Dewletê jî ceza daye 5 girtiyên di grevê de ne... ***RÛPEL - 6***

# Polîsan li êrîşa faşîst temaşe kir

Piştî daxuyaniyên tund ên rayedarên dewletê ku li hemberî DTP'ê hatin dayîn duh êrîşeke xeternak li Îzmîrê pêk hat. Piştî Erdogan, Bahçelî û Baykal DTP kir hedef, nijadperestan êrîşa konvoya DTP'ê kir û gelek kes bi giranî birîndar bûn

### FAŞÎSTAN ÊRÎŞÎ WESAYÎTAN KIR

Heyeta DTP'ê ku Hevserok Ahmet Turk jî di nav de bû, di çarçoveya kampanyaya ji bo 'Berlêvekirina çareseriya pirsgirêka kurd' ji Îzmîrê gera xwe ya herêma Egeyê da destpêkirin. Heyeta DTP'ê ya ku duh bi balafirê çû Îzmîrê ji aliyê konvoyeke ji zêdetirî 2 hezar wesayîtan pêk tê hate pêşwazîkirin. Kurdên li Îzmîrê dijîn û gelek kesayetên demokratêk ên ji gelên cuda hatin pêşwazîkirina DTP'ê. Lê hêzên faşîst xwe li vê coşê ranegirtin û êrîşî konvoya DTP'ê kirin.

### TURK: BÊYÎ OCALAN ÇARESERÎ NABE

Konvoya DTP'ê li semta Eşrefpaşa û Dortyola Hatayê ya Îzmîrê ji aliyê komek nijadperest ve rastî êrîşê bi dar û ber hat. Di êrîşê de camên gelek wesatiyan şikestin. Ji nava konvoyê yek jê bi giranî gelek kes birîndar bûn. DTP'iyan diyar kir ku polîs li dijî êrîşê bêdeng mane û mudaxaleyî êrîşkaran nekirine. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk got walî destûr daye komên faşîst û alîgirên xwînrijandinê. Turk dîsa dubare kir ku pirsgirêk bêyî Ocalan nayê çareserkirin... ***RÛPEL -4***




## Bi çavê zarokan zarok...

*Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê di çarçoveya çalakiyên 20'ê Mijdarê Roja Zarokan a Cîhanê bi armanca balkişandina ser zarokên mexdûrên TMK'ê, kuçeyan û tên qetilkirin, li kolana komele lê bi navê, "Bi Çavê Zarokan Zarok" pêşangeha wêneyan vekir. Di pêşengeha diyarî Ceylan Onkola li Navçeya Licê ya Amedê bi roketavêjê hate qetilkirin û Ugur Kaymazê bi 13 gulan bi bavê xwe re li Navçeya Qosera Mêrdînê hatî qetilkirin de bi dehan wêneyên zarokan kişandîn hatin pêşkêşkirin.*

## 'Em nexşeriya xwe dixwazin'

Bi hezaran kesên beşdarî meşa 'Em Nexşeriya Xwe Dixwazin' ya ji hêla Şaxa MEYA-DER'ê ya Êlihê ve hatî pêkanîn bûyî, xwestin ji bo aştiyê nexşeriya Ocalan amade kirî, bê aşkerakirin. Parlamenterê DTP'ê Bengî Yildiz diyar kir ku ji ber ku pirsgirêk bi muxataban re nayê nîqaşkirin, bi mantiqeke seqet dimeşe. Her wiha li ser navê girseya heta Kuçeya Hunerê meşiya Dîcle Anter daxuyaniyek da û got heke aştî pêk neyê dê zirar û ziyanên mezin bigihijin gel.

# Jinên kurd lez da çalakiyên girseyî



Çalakiyên jinên kurd ên li hemberî tundiya li dijî jinê vegeriyan protestokirina şert û mercên giran ên nû li Îmraliyê hatine avakirin

### Li Dêrsim û Gimgimê çalakî

Meclîsa Jinê ya DTP'ê ya navçeya Gimgimê di çarçoveya kampanya 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" de meşek bi meşale pêk anîn û tecrîta li ser Rêberê Gelê Kurd Adullah Ocalan şermezar kirin. Jinan diyar kir ku ew bi tu awayî şert û mercên Ocalan ên heyî qebûl nakin... *RÛPEL 7*

### Li Qoserê mîtîng hat lidarxistin

Mîtînga Jinan a ji aliyê Tevgêra Jinên Azad û Demokratîk di çarçoveya "Em jin in ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" hate amadekirin, li Qoserê bi beşdariya sedan jinan pêk hat. Jin ji Şemrex, Dêrik, Nisêbîn, Mîdyat, Kerboran û bajarokên Ewêna, Elfan, Girêmîra, Barman û Stilîlê jî tevli bûn.








www.arsivakurdi.org

Nûçeyên der heqê şandina pênc girtiyan ji girtîgeha Îmraliyê re û guhertina cihê Rêber Apo di navgînên çapemeniyê de cih girtin. Di van nûçeyan de, der barê girtiyên hatine şandin de hin agahî hatin dayîn. Parêzer û birayê Rêber Apo ên çûne serdana wî jî ev nûçe piştrast kirin.

Daxuyaniyên bira û parêzerên Rêber Apo, bêguman wê nîqaşen li ser mercên jiyanê yên Rêber Apo têne kirin, kûrtir bikin. Ji ber ku agahiyên tên dayîn gelek bi guman in û mirov dixin nava xof û fikaran.

Bira û parêzerên Rêber Apo dan xuyakirin, ku cihê nû yê Rêber Apo lê hatiye bicihkirin, ji cihê berê xerabtir e. Diyar kirin, ku cihê lê tê ragirtin ji cihê berê biçûktir e, baş nikare hewayê paqij û nefesê bigire, şert û mercên hevdîtina wî ya bi xizm û parêzerên xwe re xerabtir bûne û hînê destûr jê re nehatiye dayîn bi girtiyên nû re rûnê.

Agahiyên hem parêzeran û hem jî birayê Rêber Apo dane, di serî de gelê kurd ji aliyê raya giştî ya demokratîk û derdorên pêwendîdar ve bi tu awayî nayên qebûlkirin û ev yek nikare bi bêdengî bê pêşwazîkirin. Berî niha gelek caran hatibû ziman. Nêzîkatiya li hemberî Rêber Apo, nêzîkatiya li hemberî gelê kurd e. Ev rastî bi vî awayî careke din bi nebaşkirina şert û mercên jiyanê yên Rêber Apo hatine destnîşankirin.

## Rêgeh

**CEMÎL BAYIK**

# Pêkanînên li dijî Rêber Apo li dijî gelê kurd in

Navê wê bi gotinên cuda bê bilêvkirin jî, bi mehan e pirsgirêka kurd weke rojeva bingehîn a Tirkiyeyê tê nîqaşkirin. Di nava van nîqaşan de, hikûmeta AKP'ê aniye ziman ku wan der heqê vê pirsgirêkê de gavên erênî avêtine. Partiyên faşîst ên mîna MHP û CHP'ê jî, li hemberî van pêngavan qaşo yên AKP'ê, ketine nava helwesteke dijber. Nîqaşen di vî warî de hatin kirin jî, di 10'ê mijdara 2009'an de bi danûstandinên li Parlamenterê dest pê kirin re, ji hin aliyan we zelal bûn. Di van nîqaşan de partiyên faşîst ên mîna MHP û CHP'ê anîn ziman ku pirsgirêka kurd bi tenê bi komkujiyan dikare bê çareserkirin û derket holê ku AKP jî di mijara çareserkirina pirsgirêka kurd de xwedî projeyekê nîn e. Her çend berdevkên AKP'ê di axaftinên xwe de gotinên cuda bikar anîn jî, ji bilî gotina; "Bikaranîna rêbazên klasîk ên siyaseta tunekirin û tunehesibandinê tu encam nayê standin" AKP'ê tu daxuyaniyeke cuda neda.

Bi vî awayî, careke din derket holê ku hem MHP û CHP, hem jî AKP di çarçoveya rola ji wan re hatiye dayîn de, li parlamentoyê tevgeriyane. Di danûstandinên li parlamentoyê de, MHP û CHP'ê rola polîsê baş dane AKP'ê û niyeta rast a AKP'ê ya li hemberî pirsgirêka kurd derketiye holê. AKP'ê di nêzîkatiya xwe ya ya ji bo şert û mercên girtî yên Rêber Apo, helwesteke cuda nîşan nedaye. Nebaşkirina şert û mercên Rêber Apo tê de tê ragirtin, vê tabloyê radixe ber çavan. Ev rastiya AKP'ê ya careke din derketiye holê, ne rewşeke gelekî matmayî ye. Ya rast, AKP bi vê yekê re, niyet û rûyê xwe yê rast nîşan daye.

AKP'ê hewl daye, li nava raya giştî hewayekê biafirîne. AKP'ê bi gotinên bi kar aanîne hewl daye xwe weke 'hawariya demokrasiyê' destnîşan bike û xwestiye îlîzyonekê biafirîne ku bi tenê ew dikare pirsgirêka kurd çareser bike. AKP negihaştiye vê armanca xwe û rûyê xwe yê rast bi vî rengî, bi xwe nîşan daye. Di heman demê de hewl daye, di mijara şert û mercên jiyanê yên Rêber Apo de, rewşeke gemarî biafirîne. Derketiye holê ku di vî warî de dixwaze bi rastî çi bike. Şert û mercên nû yên Rêber Apo tê de tê ragirtin jî, weke dokûmana piştrastkirina vê yekê xwe daye der.

Tê zanîn, ku ji bilî AKP'ê tu partî tune ye ku dizane Rêber Apo ne girtiyekî ji rêzê ye. Di dema hikûmeta AKP'ê de, bi milyonan mirovan bi îmzeyên xwe re aşkera kirine, ku Rêber Apo vîna wan a siyasî ye û di Newroza sala 2005'an a li Amedê de jî, li meydanan Rêber Apo weke rêberê xwe qebûl kirine. Hêrs û nerazîbûna gel a li dijî jehrdayîna Rêber Apo, dîsa di dema hikûmeta AKP'ê de rûda. AKP'ê ev pêvajo hemû jiya û gelekî baş dizane ku Rêber Apo girtiyekî ji rêzê nîn e. Li gel ku di haya vê rastiyê de ye jî, AKP'ê şert û mercên jiyanê yên Rêber Apo nebaş kir û ket nava helwesteke bi vî rengî. Û gava ev yek kir jî, çawa ku ji bo pirsgirêka kurd got "vebûna demokratîk" û dûre helwesteke berovajî nîşan da, di vê mijarê de jî hewl da nîşan bide ku ew şert û mercên jiyanê yên Rêber Apo baş dike, lê xerabtir kir.

Hêzên Demokrasî û Azadiyê yên kurd, der heqê şert û mercên jiyanê yên Rêber Apo de, berî niha nêrînên xwe bi raya giştî re parve kiribûn. Gelek caran bal kişandin ser şert û mercên jiyanê yên Rêber Apo û riya rastkirina van mercan destnîşan kiribûn. Lê belê AKP'ê helwesteke berevajî vê yekê nîşan da û bi vî rengî niyeta xwe ya rast nîşan da. Êdî her kesî dîtiye ku AKP bi vê yekê re dixwaze çi bike û gava dibêje ez ê pirsgirêka kurd çareser bike, mebesta wê ya rast çi ye, ji aliyê her kesî ve tê zanîn. AKP dixwaze, polîtîkaya xwe ya nû ya tunekirin û tunehesibandinê, ji ser tunekirina Rêber Apo û PKK'ê bimeşîne. Çawa ku berî niha hin hêzan bi gotinên cuda xwestin heman polîtîkayê bicih bînin, bi awayekî zelal derketiye holê ku AKP di vê rê de ye û dixwaze heman polîtîkayê têxe pratîkê. Lê belê, yên beriya AKP'ê ev rê û rêbaz hilbijartin, bi ser neketin û tune bûn. AKP jî bi vê polîtîkaya xwe ya li hemberî Rêber Apo û pirsgirêka kurd wê heman aqûbetê bijî û nikare tu encamê jî bi dest bixe. Hikûmet AKP'ê bi vê helwesta xwe re, wê hîn bêtir pirsgirêkê bixetimîne. Di vê de jî wê AKP winda bike.

Gelê kurd, wê li hemberî nebaşkirina şert u mercên jiyanê yên Rêber Apo bêdeng nemîne. Gelê kurd wê careke din nîşan bide, ku ev helwesta li hemberî Rêber Apo li hemberî wan bi xwe ye.

# Cawê sifir



**Oymen, zihniyeta dewleta Tirk û CHP'ê, 'kuştin û tunekirina gelê kurd' aşkera kir. Tayyip Erdogan jî, dixwaze ku, bi 'xîtabeta delal' kurdan bixapîne**

MEDENÎ FERHO

Erêniya îradê û hişmendiyê, hêsanî nayên erêkirin.

Piştî şerê 25 salan û berdêlên giranbuha, hişmendiya erênî kete rojevê. Lê erk û hêz hîna di bazarê de ye. Ev jî îrade ye... Her çiqas di 29'ê Adarê de, di şerê Oramar û Zapê de îrade derketibê holê jî, desthilatdariya AKP'ê, bi konseptên nû dixwaze, vê îradayê têk bibe.

Di van rojên ku generalên artêşa Tirkiyeyê, (wek mînaka general Erdîl) di nava xwe de şerekî mezin dikin; Erdogan jî, "xîtabetên delal û dewlemendiya ferhengî" dike. Eger Platon sax bûya û guhdariya Erdogan kiribûya, ewî pêşniyazî 'Saziya Zimanê Tirkî' bike ku xelata karanîna herî ba û ya zimanê tirkî, bidinê. Platon, evîndarê axaftina delal û dewlemendiya ferhengî ya Atînayiya ye. Vê yekê tîne ziman jî.

Lê zanistên din, li dijî Platon derdikevin; ji bo Cretaniyan dibêjin: Ew di axaftinên xwe de giringiyê didine hişmendiyê... Lê Zeno, heman tiştî nabêje û du tiştan giring û cuda derdixê pêş. Yek têgihiştin, ya din jî axaftina tenê bi gotinên delal, lê vala... Yanî, axaftina dewlemendiya ferhengî, têra realîtê nake. Dem kin e, xapînokî ye... Montaigne dibêje, "ev riya arzan e..." Di encamê de li serê mirov dibê bela û fatura wê jî biqasî wê belayê giran e...

Di demeke ku, albay ji balkonan de tên avêtin, dadger bi guman xwe dikujin, tîmên taybet bi yek fişeka di serî de, têne kuştin; Erdogan muxalefetê miştixul dike; Dawudoglu û awaneyên wî, li dora kurdên IFARE, KETÎ û NEFILANDÎ digerin.

Pêşî em wateya van gotinan bêjin, piştre em vegerin ser dabaşa xwe.

IFARE, piştî rez-quraftinê, gurnîkên di mêwan de dimînin. Beşê biçûk û ne sûdewar.

KETÎ, kesên westiyayî, xwe li ber qîr û teşqeleyên cîhanê nagirin, li paş mayî, nêkêr, bêkêr û bêzar re tê gotin... Ji bo nanê di tenûrê de dikevin û dişewitin jî tê gotin.

NEFILANDÎ, mêweya berî bigihe û dikevê erdê. Hîna kerik diweşê binê darê...

Ev her sê nifş jî "cawê sifir" in. Caw, çapanê bi dest tê çêkirin e. Cawê cûmikê. Çapan!.. Sifir!.. Tunebûn e, qelb e, ne saxlem e... Wek bafûn… Cawê sifir: Ji bo mirovên ku di çarçoveya her sê gotinên ku me li jor anîn ziman de, tê gotin. Wek mînak: Filankes, ifare ye, cawê sifir e... Bêvankes, mirovekî nefilandî ye, cawê sifir e... Yan jî, mirovekî ketî ye, cawê sifir e...

Cawê sifir: Netûwî ye...

Konsepta dawî ya Erdogan û Başbug, li ser kesên ji PKK'ê reviyan e, kesên li dijî PKK'ê ne radiwestin. Yên li dijî PKK'ê jî du beş in. Yek, kesên ku berê bi PKK'ê re kar dikirin, piştre ji PKK'ê dûr ketin. Du, hinek kesên ku qencî bike, xerab jî bike li dijî PKK'ê ne...

Her du bask jî, di aliyê giyan û hişmendiyê de, xwe di radeya herî bilind de dibînin û tenê li pêşiya neynikê dinêrin. Ev jî tê wateya ku tenê li axaftina ferhengî dinêrin. Li soz û ehdên rayedarên dewleta tirk êmin dibin. Li pey û binê gotinê nanêrin. Ne dîrokê zanin û ne zimanê sîstema fermî ya dewleta Tirkiyeyê fêm dikin.

Dixwazim du mînakan ji dîrokê bidim: Yek, Emînê Perîxanê, axayê Rama ye... Ji sedema şerê li dijî tirkan, reviyabû Binyaxetê. Dewleta Tirkiyeyê bi riya birayê wî, jê re şand ku ew EFÛ kirine. Dibêjin, bila werê, li ser destê te, em wî efû dikin. Emîn jî, li gotina birayê xwe êmin dibe û karûbara xwe dike ku vegerê Batmanê. Lê di Oda Tirbespiyê de, bi Haco û civatê dişêwire. Haco, dibêje, "bextê tirkan nîne, neçe wê te bikujin". Emîn dibêje, "efû li ser destê birayê min dane." Haco û kesên di odeyê de, çiqasî dibêjin, xêr nake û Emînê Perîxanê razî nakin. Haco, di nava sed mêrî de, her du destên xwe ber bi Xweda hildide û dibêje: "Emîn, tu biya me nake, em nikarin te bi zorê bigirin, lê berî ku tu biçe, em fatiha te bixwînin û dibêje: El fatîha li ser ruhê Emîn Axa û fatiha wî dixwînin." Piştî ku Emîn vedigere, dibinê konê birayê wî de; Romiyên Tirk, her du destên wî kelepçe dikin, wî zincîr û lele dikin û dibin riya çûn û nehatinê. Emîn, li birayê xwe dinêre, dibêje, "ka soz, ka ehd, ka efû?" Birayê wî, neçarî û bezariya xwe bi gotinên "heyf û mixabin, em xapandin" tîne ziman. Emîn, dibêje, "bira, ez taştê me tu firavîn î."

Du, piştî serîhildana Bagokê (1926), Haco û 18 eşîrên Federasyona Hevêrka direvina Binyaxetê. Di dema tevgera sazkariya Xoybun de, dewleta tirk, bi propagandeyeke xurt ya devkî û tilbêtên kurtîlkuj, heydêniyeke efuwê bela dike. Dewleta Tirk baş zanê ku hêza eskerî ya Xoybunê, Hevêrka û Berazan e... Armanca dewleta tirk ew e ku, bi propagandeya efuwê, hêza Xoybûnê kêm bike. Koçberên kurd, bêzar û şepirze ne. Tirk bi riya kurtîlkujan dibêjin; "kesên ku vegerin, nayên girtin, wê serbest biçin gundên xwe û dewlet wê mesrefa wan jî bide". Serkêşên kurdan çiqasî dibêjin, "derew e, davik in, xap in" kes guhdariya wan nake. Mêr, jin û zarok vedigerin.

Roma Reş, kesên ku vedigerin, jin, mêr û zarokan, kişûmat, li gundê Eleqemşê kom dike. Mêran dikine hewşa mizgeftê, jin û zarokan jî dikine hefşa mala axayê gund. Dewleta tirk, kesên vegeriyane jî bes nabîne. Li gundên girêdayî Nisêbînê, ji tixub/sînor heta bi qeraxên Bagokê, heta bi gundên Hezexê, bangî mêran dike ku, biçin Eleqemşê.

Dibêje, "werin kom bibin, em ê ji bo kesên vegeriyane şahiyekê li dar bixin û bixêrhatina wan bikin". Balkêş e ku, gundiyan mecbûrî çûna Eleqemşê jî dikin. Piştî ku gundiyên derdoran jî li Eleqemşê kom dikin, di hewşa mizgeftê de mêran, di hewşa din de jî zarok û jinan gulebaran dikin. Piştî komkujiyê, cesedan teva dişewitînin.

Li gorî Cegerxwîn, di komkujiya Eleqemşê de 2500 kes, li gorî lêkolîna min, 4500-5000 kes, di yek rojê de hatine kuştin.

Ji komkujiya Eleqemşê 3 zarok xelas bûbûn. Her sê jî, ji hêbet û xezebê lal bûbûn... Birahîm yek ji van zarokan bû û li mala Hiseynê Hesenê Haco mezin bû. Lê dema ku behsa Eleqemşê dihate kirin, digiriya û axaftin jê çênedibû. Lal dibû.

Mînakên din, Cemîlê Çeto, di 'Nutuka' Mustafa Kemal de cih digire û desteka mezin dide Mustafa Kemal. Lê ew jî ji kuştina bi destê Roma Reş xelas nebû. Mînaka din jî Çelebî ye, hevalbendê dewletê bû, piştre bi destê dewletê hate kuştin û hîna jî gora wî ne diyar e. Tenê tê zanîn ku gora wî, li Dîlokê veşartî ye. Yan jî Seyîd Riza, di şerê li dijî rûsan de, wek gelek eşîrên kurd, destek da dewleta Tirkiyeyê. Lê, ew û sed hezar Dêrsimiyan jî, ji hişim û buxza Roma Reş xelas nebû.

Mînakên bi vî rengî, pirr in.

Vêca, kesên herî baş hêza PKK'ê, rêkûpêkiya sîstema Hereketa Kurd û hişmendiya gelê kurd ya xwedî derketina li îradeya xwe, dizane ew kesên veqetiyan e, reviyan e û xeyîdîne... Guman dikim ku ev kes û derdor, dewleta tirk, bi her cure teleqareşî û bextreşiya we jî, baş nas dikin. Her çiqasî hinek kesên KETÎ, nameyan bi riya mirovên, bêsilûk û ketî ji serokwezîrê tirk re, şandibin jî, çerxa nasyonalîst a dewleta tirk baş nas dikin. Gelo ev kes û derdor bi çi dixapin?

Onur Oymen, zihniyeta dewleta Tirk û CHP'ê, "kuştin û tunekirina gelê kurd, hebûna Komara Tirkiyeyê" aşkera kir.

Tayyip Erdogan jî, dixwaze ku, bi "xîtabeta delal û dewlemendiya ferhengî" kurdan bixapîne. Dixwaze parçe bike, birakujiyê dubare bike...

Lê kurd, Erdogan baş nas dikin û baş dizanin ku wateya gotinên wî mirin, êş û azar in. Erdogan, ji bo çareseriyê, gelo operasyonên eskerî dane rawestandin? Gelo, avêtina ser malên welatparêz û DTP'iyan daye rawestandin? Gelo, zarokên di girtîgehan de serbest berdane? Gelo terorîzekirina gelê kurd terk kiriye? Gelo, nexweşên di zindanan de serbest berdane? Gelo serokatiya gelê kurd serbest berdaye? Gelo, ji sedema komkujiyan lêborîna xwe xwestiye? Gelo, serdana Erdogan a Dafûrê û têkiliya bi Al Başîr re, çiqasî nakokî ye, nayê zanîn? Gelo şova Erdogan ya li Dawosê nabe neynika karûxebatên wî? Gelo, fermana ku, ji bo kuştina zarok û jinên kurdan da û şova wî ya Dawosê, çiqasî nakoki ye, nayê zanîn? Gelo, gelo, gelo, gelo!....

Gelê kurd, bi lîstikên matemetîkî, fizîk û geometrîk nema tê xapandin. Yanî, hejmara matemetîkî, çerxa fîzîkî û hesabên geometrîk; yên Ifare, nefilandî û ketiyan pirsgirêka kurd çareser nabe.

Kurd, di cîhana biçûk de, hanya jî, konya jî, baş nas kirine.

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mustafa AGGÜL
Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
Tel: 0 (412) 237 48 91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı(Çap):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
Yaygın Süreli Yayındır

# Di 'Roja Mafên Zarokan' de îşkence li zarokekî hat kirin

Seyît AKYUZ/ EDENE - DÎHA



Zarokê bi navê H.K. (15) ê li taxa Barbaros a navçeya Seyhanê rûdinê roja 20'ê mijdarê ji aliyê polîsên Midûriyeta Polîsan a Edeneyê ve bi hinceta kevir avêtiye dibistanê li cihê kar hate binçavkirin, li Midûriyeta Şaxa Zarokan a Polîsan rastî îşkenceyê hatiye.

Li Tirkiyeyê di 'Roja Mafê Zarokan a Cîhanê' de jî li zarokan îşkence dibe. Di 20'ê Mijdarê Roja Mafê Zarokan a Cîhanê de li Edeneyê, zarokê bi navê H.K. hate binçavkirin û hat diyarkirin ku H.K. di binçavan de rastî îşkenceyê hatiye. Di roja ku li gelek welatan ji bo 20'ê Mijdarê Roja Mafê Zarokên Cîhanê çalakî û şahî hatin lidarxistin de li taxa Barbaros a Edeneyê zarokê bi navê H.K, rastî îşkenceyê hat. Zarokê bi navê H.K. (15) diyar kir ku di dema polîsan ew li cihê karê wî binçav kiribû li Midûriyeta Polîsan lê dane û neheqî lê kirine.

**'Îşkence li min kirin'**

H.K. diyar kir ku cara duyemîne wî binçav dikin û wiha axivî: "20'ê mijdarê serê sibê saet dora 9 bû wesayîtek sivîl cihê ku ez lê dixebitim ez binçav kirim. Pêşî ez birim qereqolê. Piştre em çûn midûriyeta polîsan ya Şaxa Zarokan li wir milê min tewandin û bi sîleyan û pêhnan li min xistin. Piştre midûrê wan hat û ji min re got 'Te çi guneh kiriye' min jî got min tu guneh nekiriye. Dîsa midûr got 'Te çawa guneh nekiriye, di destê me de dîmenên te hene. Tu tev li çalakiyan bûyî' Min jî qebûl nekir. Piştre her du polîsan li min xist û gotin 'Em dê duşemê dîsa te bibin. Tu dê derkevî dadgehê' û piştre ez berdam.

H.K. destnîşan kir ku dema polîsan ew kirin binçavan sîxurî teklîfî wî kirine û wiha got: "Li qereqolê ji min re gotin 'Tu çiqas pere distînî. Min jî got ez 70 TL distînim. Ji min re gotin 'Em 70'ê TL'yî bidin te tu jî alîkariya me bike'. Min got hûn daxwaza sîxurtiyê li min dikin. Gotin 'Na em dibêjin alikariyê bi me re bike.' Min ev qebûl nekir dîsa li min xistin û gotin ên ku wan tiştan bi we dikin ermenî ne. Ji min re gotin tu jî ermenî yî. Piştre bi sîle û pêhnan li min xistin û lêva min teqandin. Devê min xwîn kirin."

Bavê H.K., Mahmût K. serî li Şaxa Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) a Edeneyê da û piştgiriya hiqûqî xwest.

# Îranê darvekirina Şêrko Maarfî rawestand

**Dewleta Îranê biryara darvekirina ciwanê kurd Şêrko Maarfî (30) rawestandiye. Parêzerê Şêrko Maarfî, Xalid Behramiyan diyar kir ku Rayedarên Girtîgeha Seqiz cezayê darvekirina Maarfî rawestandiye**



Li Îranê biryara darvekirina girtiyê kurd Şêrko Maarfî hate rawestandin. Îran ji ber bertekan paşve gav avêt û darvekirina Şêrko Maarfî rawestand. Rêxistinên Mafên Mirovan ji bo biryara darvekirina Şêrko Maarfî kampanya dabû destpêkirin û li gelek bajaran kurdan bertek nîşanî Rejîma Îranê da ji ber wan bertekan Îran paş ve gav avêt. Hate zanîn ku Îran ji tirsa çalakî û bertekên PJAK'ê mecbûr ma darvekirina Şêrko Maarfî rawestand. Beriya Şêrko Maarfî endamê PJAK'ê Îhsan Fetahiyan hatibû darvekirin û kurdan bertek nîşanî rejîma Îranê dabûn.

Hate zanîn ku dewleta Îranê biryara darvekirina ciwanê kurd Şêrko Maarfî (30) rawestandiye. Parêzerê Şêrko Maarfî, Xalid Behramiyan, bi farisî di BBC de axivî û diyar kir ku Rayedarê Girtîgeha Seqiz cezayê darvekirina Maarfî rawestandiye. Parêzer Behramiyan, anî ziman ku rayedarê girtîgehê bi rawestandina cezayê darvekirinê, li gorî zagonan dibe ku dîsa rê li pêşiya darizandinê vebe.

**Cezayê darvekirinê dabûn wî**

Ciwanê kurd Şêrko Maarfî (30) ku di hucreya yek kesî de li Girtîgeha Seqizê dihat girtin bi îdiaya endamê PAJK'ê di 2 cotmeha sala 2008'an de li bajarê Baneyê ku lê ji dayik bûbû hatibû girtin. Maarfî, di çileya sala 2009'an de ji aliyê Dadgeha Şoreşê ya Saqizê ve bi sûcdariya "Şerê li dijî xwedê" bi cezayê îdamê hatibû tawanbarkirin. Rêxistina Efûya Navneteweyî jî bi danazanekê xwestibû cezayê wî bê rawestandin û ji nû ve bê darizandin. **LONDON**


# Li Dîlokê di şerekî de kesek mir

Li Dîlokê şer di navbera du koman de qewimî. Di şer de çek hate bikaranîn û di encamê de kesek mir û kesek jî bi giranî birîndar bû.

Li gor agahiyên bi dest ketiye li taxa Mahsunî Şerîf di navbera du koman de şer derket û di şer de çek hat bikaranîn û kesê bi navê Muzafer Balta jiyana xwe ji dest da. Hate zanîn ku tu eleqeya Balta bi şer re tune ye, Balta şoferê dolmişê ye û gava ji cihê bûyerê derbas bûye gule îsabetî wî kiriye û Balta li Nexweşxaneya Dewletê jiyana xwe ji dest da. Mustafa Alagoz jî ji ber şer bi giranî birîndar bûye û li Nexweşxaneya Sanî Konukoglu tê dermankirin. Der barê bûyerê de lêkolîn hate destpêkirin. **DÎLOK**

# Dîsa girtîgeh, dîsa binpêkirinek bêdadî

Binpêkirinên li girtîgehan bi dawî nabin. Ligel hemû îdiayên hikûmetê yên der barê girtîgehan de jî girtiyê bi navê Gungor Oktar ku bi boneya 'Endamtiya PKK'ê' li Girtîgeha Tîpa E ya Mûşê tê girtin, ji ber xirabûna cergê wî, terkî mirinê hate kirin. Nexweşiya pnomotoraks bi Oktar re heye. Ligel ku Oktar 5 caran emeliyat bûye û nikare xwe li ser piyan bigire jî Saziya Tipa Edlî rapora "Hewceyî bi rawestandina înfaza wî tune" da. Ligel îdiayên Hikûmeta AKP'ê yên têkildarî başkirina şert û mercên girtîgehan her roj bi binpêkirineke mafên girtiyan derew derdikeve. Girtiyên bi nameyan pirsgirêkên xwe ji derve radigihînin jî rastî cezayên dîsîplînê tên.



Herî dawî nameya ji Girtîgeha Tîpa E ya Mûşê hatî rewşa girtîgehan radixe ber çavan. Oktar bi nameya ji Nûnerê Xwendevanan ê Rojnameya Gunlukê Huseyîn Akyol re şandî îdiayên hikûmetê û binpêkirinên li girtîgehan radixe ber çavan. Oktar ku 15 sal berî niha bi boneya, "Endamtiya PKK'ê" hatiye girtin bi nameya şandî pirsgirêkên xwe vegotin. Oktar ku heta niha 5 caran emeliyat bûye, li Wan û Elezîzê tedawî dîtiye, nikare xwe li ser piyan bigire û her tim di nav cihan de ye. Oktar nikare hewceyiyên xwe yên rojane jî tenê bi cih bîne.

Oktar di nameyê de diyar dike ku ligel serî li gelek saziyên fermî daye jî heta niha tu bersiv negirtine û wiha domand: "Di nav vê demê de tedawiya min jî hate rawestandin. Min serî li Saziya Tipa Edlî da lê bêyî muayeneyekê bike rapora 'Hewceyî bi rawestandina înfaza ceza tune ye' da. Nexweşiyê vedigerînin îşkenceya psîkolojîk. Ji bilî bendewariya mirinê tu çareyên din nahêlin. Hêviya me hevalên li girtîgehan girêdayî hîstiyariya hevalên ji derve ye. Em li benda piştgirî û hestewariya piştgiriya ji derve ye." **ENQERE**

## Nexweşiya Pnomotoraks çi ye?

**NEXWEŞIYA** pnomotoraks ku tê wateya xitimîna cîgerê ji ber darbeyên li sebeta sing bikevin û hewa ketina valahiya cîgeran derdikeve holê. Di encama vê yekê de cîger hêza xwe vekirî bihêle nabîne û wekî bapivokekê dikişe hev û diçilmise. Li gorî pisporan divê bi çar awayan tedawiya vê nexweşiyê bê kirin. Di merhaleya yekemîn de îstarihat û tedawiya oksîjenê. Merhameya duyemîn de girêdana tubên oksîjenê, merhaleyên sêyemîn û çaremîn jî ku bi navê aspîrasyonê tê zanîn bi derman û emeliyatan tên kirin. Di van pêvajoyan tevan de divê nexweş di nav şert û mercên baş de bê girtin.

# Li Êlihê mirina bi guman

Li Êlihê kesek ji serê xwe bi çekê birîndar xwarî hate dîtin. Çeka pê birîndar bibû jî li cihê bûyerê bû. Hate zanîn ku kesê ji serê xwe birîndar hate dîtin Firat Bîlal (30) e û li Nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest daye.

Li gorî agahiyan Firat Bîlal li taxa Bahçelîevlerê rûdinê bi awayekî gumanbar li kolanê birîndar hatiye dîtin û li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest daye. Çeka pê hatiye birîndarkirin jî li cihê bûyerê li ber serî wî hate dîtin. Der barê bûyerê de lêpirsîn hate destpêkirin. **ÊLIH**

# Dergevan bû mexdûrê leşkeran

Hemwelatiyê bi navê Îsa Arabaci ku ev 15 sal in li Lojmanên Alaya Komandoya Cendirmeyan a Halkaliyê dergevaniyê dike, piştî lojman ji hêla TOKÎ'yê ve hatin kirîn, bêyî tazmînat ji kar hate avêtin. Arabaci bi riya Sendîqaya Karkerên Konutan li 9'emîn Dadgeha Kar a Bakirkoyê der barê Femandariya Herêma Cendimeyan a Balmumcu û Rêveberiya Lojmanên Komandoyê de doz vekir.



Hemwelatiyê bi navê Îsa Arabacı ev 15 sale li Lojmanên Alaya Komandoya Cendirmeyan a Halkaliyê dergevaniyê dike. Piştî demek berî niha lojman ji hêla TOKÎ'yê ve hatin kirîn, bêyî tazmînat bê dayîn Arabaci ji kar hate avêtin. Arabaci serî li Sendîqaya Karkerên Konutan a girêdayî da. TOKÎ'ya 4 hezar TL pere da Arabaci bêyî, karek bide li holê hişt. Sendîqayê li ser xebata Arabaci 30 hezar TL pere ji rêveberiya lojmanan xwest bes ev daxwaza wî hate redkirin. Li ser vê yekê Arabaci bi riya Sendîqaya Karkerên Konutan li 9'emîn Dadgeha Kar a Bakirkoyê der barê Femandariya Herêma Cendimeyan a Balmumcu û Rêveberiya Lojmanên Komandoyê de doz vekir. Danişîna yekemîn a dozê di 24'ê mijdarê tê dîtin.




Serokê Sendîqaya Konut Îş'ê Nebîl Irmak Çetîn balkişand ser mijarê û daxuyand ku gelek kes di vê rewşa qeyranê de ji kar tê avêtin û wiha got: "Herî zêde karker ji vê qeyranê bandorê digirin. Ji kar tên avêtin û mexdûriyet mezin dijîn. Ev malbat jî hem ji kar hem ji mal hatiye avêtin. Hem betal e û hem jî li kar digere. 30 lojman hene û xwediyên tevan jî karsaz in." Irmak diyar kir ku dê dozê heta dawiyê bişopînin. **STENBOL**

# Konvoya leşkerî ber bi sînor ve diçe

Di navbera navçeyên Gever û Şemzînan a Colemêrgê de sewqiyata leşkerî hate kirin.

Konvoya leşkerî bi wesayîtên zirhî ve ji Geverê kete navenda Şemzînanê. Hate zanîn ku konvoya leşkerî ketiye ser riya sînor. Leşkerên tirk bênavber sewqiyatê dibin ber sînor û riya Şemzînanê bi kar tînin. **COLEMÊRG**

# Li Sûriyeyê 300 girtiyên kurd 25 roj in di grevê de ne

**Greva birçîbûnê ya şermezarkirina zext û zorên dewleta Sûriyeyê ya kurdên girtîgeha Edraya Şamê ket roja 25'an û rewşa tenduristiya girtiyên kurd ên di çalakiya grevê de ne her diçe xerab dibe**

Greva birçîbûnê ya 300 girtiyên endamên Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) bi armanca şermezarkirina zordariyên li girtîgehan û başkirina şert û mercan di 30'ê cotmehê de dane destpêkirin kete roja 25'an. Hate zanîn ku Dadgeha Şamê ya Dewletê jî ceza daye 5 girtiyên di grevê de ne.

Zordariya rejîma Sûriyeyê ya li ser girtiyên kurd didome. Bi armanca zordariyên li Girtîgeha Edra ya Şamê 300 girtiyên endamên PYD'ê di 30'ê cotmehê de ketibûn greva birçîbûnê. Girtî dixwazin zordarî bi dawî bibin, bikaribin bi malbatên xwe re hevdîtinê bikin û radyo û TV'ê bidin wan. KCK-Rojhilat ku têkildarî mijarê daxuyaniyek da çapemeniyê diyar kir ku rewşa girtiyan hindî diçe xirabtir dibe. Nerazîbûna li hemberî rejîma Sûriyeyê zêde dibe û çalakiyên piştgiriya girtiyên PYD'ê li gelek welatên Ewropayê didomin. Girtiyên PYD'ê ev cara 4'an e bi armanca şermezarkirina zordariyan dikevin grevê.



**Ceza dan çalakgeran**

Ligel grevê jî zordariyên li ser girtiyan berdewam dikin. Dadgeha Ewlehiya Dewletê ya paytexta Sûriye Şamê cezayê girtîgehê li 5 girtiyên di grevê de ne birî. Hate zanîn ku girtî bi boneya greva birçîbûnê beşdarî danişînê nebûne.

Hate zanîn ku girtiyên ceza li wan hatiye birîn Munzir Ebdîl, Fetah Şor, Ciwan Mihemed Ehmed, Hesen Xalid Qido, Xelîl Feydê Delî, Menan Ehmed Seydo ne. ŞAM (DÎHA)

## Êrîşê de 8 filistînî birîndar in

Balafirên şer ên Israîlê êrîş bir ser Xeta Gazzeyê û 8 kes birîndar kirin.

Çavkaniyên herêmê diyar kirin ku li başûrê Xeta Gazzeyê balafirên şer ên Israîlê êrîş birin ser tuneleke herêma Refahiyiyê, atolyeyeke hesinkariyê ya herêma Nuseyrat û karwaneke herêma Cebealiyê. Hat gotin ku balafirên Israîlê yên şer ev her sê hedef dane ber bombeyan. Berpirsê Ambulansên Servîsa Lezgîn ya girêdayî Wezareta Tenduristiya Filistînê Dr. Muaviye Hasaneyn destnîşan kir ku yek jê bi giranî bi giştî 8 filistînî birîndar bûne.

Artêşa Israîlê jî daxuyanî da. Di daxuyaniyê de got ku balafirên wan ji ber ku mîlîtanên filistînî fuzeya Kassam bera Israîlê daye êrîş kirine cihên mijara gotinê. Artêşa Israîlê îdia dike balafirên wan du cihên ku çek lê tên çêkirin û tuneleke ku ji bo qaçaxîtiyê bi kar tên kirine hedef.

Balkêş e ku ev êrîş rojek piştî daxuyaniya Wezîrê Parastina Hamasê Fethî Hammad pêk hat. Hammad di daxuyaniya dabû de aşkera kiribû ku der barê fuzeyan de rêxistinên serhildêr ên li Xeta Gazzeyê û Israîlê li hev kirine. QUDS

## Bêdadiya qanûna hilbijartinê

Li parlamentoya Iraqê li ser qanûna hilbijartinê danişîn pêk hat û encamek nehat girtin. Duh jî danişînek pêk hat û encama wê dema rojnameya me kete çapê diyar nebûbû.

Di danişîna duh de jî qanûna ji bo hilbijartina meha çileyê dest pê kir. Danişîna parlamentoyê bi giştî bi vê rojevê dest pê kir. Di danişîna roja şemiyê de hevbendiyek pêk nehat û li ser vê biryar hat dayîn ku roja yekşemê jî li ser mijarê danişîna parlamentoyê bê lidarxistin.

Çend roj berê Cîgirê Serokomarê Iraqê Tariq El Haşimî qanûna hilbijartinê ya ku di parlamentoya Iraqê de hatibû qebûlkirin veto kiribû. Wek sedem jî xwest nûnertiya iraqiyên li derveyî welat zêde bibe. Li ser vê biryarê lijneya hilbijartinê ya Iraqê xebatên xwe yên ji bo hilbijartina meha çile rawestandibû.

Di danişîna duh de mijarek jê jî li ser mafê Haşimî bû. Gelek alî di vê baweriyê de ne ku mafê Haşimî nîn e ku qanûneke wisa veto bike.

**Nerazîbûna kurdan**

Serokê Herêma Federal a Kurdistanê Mesûd Barzanî û Parlamenterê Kurd ê Parlamentoya Iraqê Mehmûd Osman jî diyar kirin ku qanûna hilbijartinê qanûneke ne adil e. Hat destnîşankirin ku di vê qanûnê de ji bo kurdên êzîdî tenê nûnertiyek hatiye cihêkirin. Her wiha nûnertiyên ku li nûnerên berê hatine zêdekirin jî ne li gorî rêjeya civakê, li gorî hevsengên siyasî yên Iraqê hatine parvekirin. Ji ber vê jî kurd li bi awayek tund li hemberî vê dertên û dixwazin di qanûnê de rêjeya parvekirina nûnertiyên nû adiltir bêne parvekirin. BEXDA

## 'Tirkiye dê leşkeran bişîne'

Hate hînbûn ku zext li Tirkiyeyê tên kirin ku hin leşkerên din bişîne Afganistanê. Li gorî rojnameya The Sunday Times, ragihand ku ew li bendê ne Serokdewletê Amerîkayê di hefteya pêşiya me de bide daxuyandin ku ew dê hejmara leşkerên li Afganistanê zêde bikin. Li gor rojnameyê dê leşker ji welatên wekî "Almanya, Îtalya, Tirkiye, Fransa û Romanya werin şandin. Ji ev welat her yek dê bi kêmanî di navbera 500 û 1000 leşkerî de leşkeran bişîne Afganistanê û ji bo pêkanîna vê yekê zext li van welatan tên kirin.

Rojnameya The Sunday Times, ku li Ingilîstanê weşana xwe dike, da xuyakirin ku çav li rê ye ku Serokdewletê Amerîkayê Obama di hefteya pêşiya me de, bide daxuyandin ku ew dê hejmara leşkerên li Afganistanê zêde bikin.

Li gor vê nûçeyê her wiha li ser operasyonên li Afganistanê tê rawestandin û ew wekî "şerê Amerîkayê" tê binavkirin û dê ji welatên NATO'yê bixwaze ku di navbera 3 û 7 hezar leşkerên din bişîne Afganistanê.

Li gorî rojnameyê, rayedarên Amerîkayê dane xuyakirin ku leşkerên Amerîka û yên hevalbendên wê dê 35 hezar leşkerên din bişînin Afganistanê ev yek ji bin daxwaza Fermandarê hêzên Amerîka yên li Afganistanê General Stanley McChrystal ne ku daxwaza 40 hezar leşker kiribû.

**Ji Tirkiyeyê 500-600 leşker**

Rojnameyê da xuyakirin ku Gurcistan hezar leşker, Tirkiye 500-600 leşkerên din qebûl kirine ku bişînin Afganistanê. Lê heta niha hikûmetê ev biryar bi raya giştî ya Tirkiyeyê re parve nekiriye. Berdevkê Sekreterê giştî yê NATO'yê Anders Fogh Rasmussen da xuyakirin ku "Ev şer ne tenê yê Amerîkayê ye". Welatên Ewropayê di 20 mehên dawî de hejmara leşkerên xwe zêde kiriye û ji 18 hezaran gihîştiye 36 hezaran. LONDON



## Li Îranê tatbîkata parastinê

Îran ji ber bernameya xwe ya nukleerî bi zext û gefên Amerîka û Israîlê re rû bi rûye. Hat diyarkirin ku ji ber vê dest bi tatbîkata parastinê ya 5 roj dê dom bike kiriye.

Li dijî Îranê ji aliyê Amerîka, Rûsya, Çîn, Fransa, Îngilistan û Almanyayê ve ambargoya aboriyê bi kar tê. Televîzyona dewletê ya Îranê diyar kir ku tatbîkat li ser qadeke 600 hezar kîlometrekare pêk tê.

Hat aşkerakirin ku tatbîkat li dijî balefir û fuzeyên xeyalî yên neyarên Îranê dê Îranê bibarêze. Li gor agahiyê armanca tatbîkatê ev e ku tesîsên nuklerê û hin noqteyên hesas li dij êrîşeke pêkan karibe biparêze.

Amerîka û Israîlê bi devê rayedarên bilind diyar kiribûn hilbijêrka leşkerî ya êrîşbirina ser Îranê li ser masê ye.

Îranê jî di bersiva vê de ev her du welat jî hişyar kirin ku di rewşeke wisa de Îran hemû hedefên Amerîka û Israîlê dê ji xwe re bike hedef. Îran di demên dawî hê pirtir tatbîkatan li dar dixe. TEHRAN

## Di qezaya madenê de 87 kes mirin

Li kana komirê ya li bakurojhilatê Çînê teqîn çêbû û di encamê de 87 kesan jiyana xwe ji dest dan. Li ser mijarê ajansa Çînê Sînhau agahî da. Hat gotin ku li bajarê Hegan a li eyaleta Heîlogjîanga sînorê Rûsyayê 400 metre di binê erdê de qezaya girîzoyê qewimiye. Di qezayê de 87 kes mirine û hê 21 kes jî di bin kana helweşiyayî de mexdûr mane.

Ji wana cihê 8 kesan hatiye tespîtkirin û xebatên rizgarkirinê didomin. Di dema teqînê de 528 karker di kanê de dixebitîn. Pirtirê karkeran piştî teqînê bi saxî hatin rizgarkirin. Kanên madenê yên herî bi talûke li Çînê ne û her sal di qezayên wisa de bi sedan karker jiyana xwe ji dest didin. PEKÎN

www.arsivakurd.org

# Jinan tecrîda li dijî Ocalan şermezar kir



Di çarçoveya kampanyaya DOKH'ê ya 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' li her bajarî çalakî pêk tên. Li Gimgim, Sêrt û Dêrsimê şîdeta li dijî jinê hate şermezarkirin û her wiha tecrîda li Ocalan hat protestokirin

Meclîsa Jinê ya DTP'ê ya navçeya Gimgimê di çarçoveya kampanya 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" de meşek bi meşale pêk anîn û tecrîta li ser Rêberê PKK'ê Adullah Ocalan şermezar kirin.

Meclîsa Jinê ya DTP'ê ya navçeya Gimgimê, bi munasebeta '25'ê Mijdarê û di çarçoveya qampanya 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' de meşek bi meşale pêk anî û tecrîta li ser Rêberê PKK'ê Adullah Ocalan şermezar kirin. Endamên Meclîsa Jinê li ber avahiya Rêxistina DTP'ê ya navçeya Gimgimê li hev kom bûn û bi pankarta "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" û dirûşmên "Bijî Serok Apo", "Bê Serok jiyan nabe", " Jin jiyan azadî" heta pazaja Şaredariya Gimgimê meşiyan.

Li ser navê jinan Endama Meclîsa Jinê ya DTP'ê Şengul Çiçek, diyar kir ku ew şîdeta li dijî jinê qebûl nakin û dê têkoşîna wan a li dijî şîdetê bidome.

Çîçek, di berdewama daxuyaniyê de bal kişand ser rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û wiha got: "Ji ber ku em jinin em li dijî hemû cudahî û neheqiyê ne. Em jinên Kurdistanî tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan qebûl nakin.

Namûsa me nasnameya me û azadiya me ye. Azadiya çand û zimanê me ye.

Têkoşîna me ya ji bo azadiya çand, ziman û nasnameya me dê bidome." Kom, piştî daxuyaniyê dîsa bi heman dirûşman heta rêxistina DTP'ê meşiya û dawî li çalakiya xwe anîn.

**Standa hate vekirin**

Meclîsa Jinê ya DTP'ê ya Sêrtê, li hemberî şîdeta li dijî jinê standa îmzeyan vekir.

Meclîsa Jinê ya DTP'ê ya Sêrtê, bi boneya 25'ê Mijdarê Roja Piştevanî û Têkoşîna li Hemberî Şîdeta li Dijî Jinê ya Navneteweyî, li Kolana Gureşê standa îmzeyan vekir. Jinan eleqeyeke mezin nîşanî standa îmzeyan dan. **MÛŞ -SÊRT (DÎHA)**




## Li Dêrsimê meşa bi meşale hat lidarxistin

**MECLISA** Jinê ya DTP'ê ya Dêrsimê bi munasebeta '25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinê ya Cîhanê' meşek bi meşale pêk anî û diyar kir ku hikûmet li hemberî binpêkirina mafê jinê bêxîret û bêkêr e.

Meclîsa Jinê ya DTP'ê ya Dêrsimê, bi munasebeta '25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Şîddeta li Hemberî Jinê ya Cîhanê' û di çarçoveya kampanya 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' de meşek bi meşale pêk anî. Jinên ku li Sûka Binerdê gihiştin hev û pankarta "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" vekirin, heta Parka Celal Dogan meşiyan. Jinan di meşa bi meşale de dirûşmên 'Xêza me Bêrîtan Rêberê me Ocalan", 'Em jin in, dayik in, alîgirê aştiyê ne", 'Em şîdeta li dijî jinê qebûl nakin" û 'Jin, jiyan, azadî" berz kirin. Piştre li ser navê jinan Endama Meclîsa Jinê ya DTP'ê Nurcan Kasun, daxuyanî xwend û xwest hemû cureyên şîdetê yên li dijî jinê pêk tên bi dawî bibin û jin mi hemberî vê yekê têbikoşin. Kasun, anî ziman ku hikûmet li hemberî binpêkirina mafê jinê bêdeng e û xwet hikûmet jî bikeve nava hewldanan. **DÊRSIM (DÎHA)**

## Jinan li gundê Zanqirtê gorên jinan ziyaret kir

Endamên Meclîsa Jinê ya Amedê gorên jinên ku li Gundê Zenqirtê ya Navçeya Şemrexê ji aliyê cerdevanan ve hatibûn qetilkirin ziyaret kir û soza têkoşînê dan. Şaredara Bîsmîlê Cemîle Emînoglu, diyar kir ku komkujiya gundê Zanqirtê encama feraseta mîlîtarîst a dewletê ye.

Meclîsa Jinê ya Bajarê Amedê, bi munasebeta '25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Şîddeta li Hemberî Jinê ya Cîhanê' çûn gundê Zanqirtê yê navçeya Şemrexa Mêrdînê û gorên jinên di komkujiya cerdevanan de hatin kuştin ziyaret kir.

Di ziyaretê de Şaredara Bîsmîlê Cemîle Emînoglu, Şaredara Gêlê Petek Çapanoglu û gelek nûnerên rêxistinên jinan amade bûn. Şaredara Bîsmîlê Cemîle Emînoglu, li ser gora jinan axaftinek kir û diyar kir ku komkujiya cerdevan di serî de xistin stûyê PKK'ê û piştre jî wekî doza namûsê şirove kirin. Emînoglu, destnîşan kir ku sedema komkujiyê feraseta dewletê ya mîlîtarîzmê ye û wiha got: "Ger ku dewletê çek neda destê cerdevanan, cerdevanan ev komkujî pêk nedianî.

Girî û qerîna zaroka bi navê Polat Çelebî ku dayik bav bi tevahî 7 xizmên xwe di komkujiyê de winda kiribûn a li ser gora dê û bavê xwe jinên gor ziyaret kir xemgîn kirin. Jinên ku gor ziyaret kirin, piştî ziyaretê ji bo beşdarî mîtînga jinan a Qoserê bibin çûn Qoserê. Gund, piştî komkujiyê çûn û hatina gund hîn ji aliyê leşkeran ve di bin kontrolê de ye. **MÊRDÎN (DÎHA)**



## Dê bibe parlamentoyê

Parlamentera DTP'ê ya Wanê Fatma Kurtulan, di civîna Mala Hemwelatiyên Azad a Karabaglarê de diyar kir ku ew dê êrîşa li dijî jinan bi hişyariya "Êdî bes e" bibe rojeva parlamentoyê.

Meclîsa Jinê ya DTP'ê ya Îzmîrê, di çarçoveya çalakiyên "25'ê Mijdarê Roja Hevgiriya Jinê û Têkoşîna li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinan a Navneteweyî" de li Mala Hemwelatiyên Azad a Karabaglarê civînek pêk anî. Di civînê de Parlamentera DTP'ê ya Wanê Fatma Kurtulan, Seroka Rêxistina DTP'ê ya Îzmîrê Mukaddes Kubilay, Însiyatifa Dayikên Aştiyê û gelek jinên din amade bûn. Di civînê de Parlamentera DTP'ê ya Wanê Kurtulan diyar kir ku DTP ji bo rê li pêşiya şîdetê bigire xebatê dimeşîne û dê mijara şîdeta li dijî jinê bi hişyariya "Êdî Bes e" bibe parlamentoyê. Kurtulan, anî ziman ku jin her tim li dijî şîdetê têkoşiyane û dê têkoşîna xwe bidomînin. **ÎZMÎR (DÎHA)**

## Li Stenbolê panel

Li Stenbolê li Zanîngeha Sabanciyê bi beşdariya Aktîvîsta Greva Jinan a Global Maggie Ronayne, Nîna Mopez û Selma James bi navê "zayend, nijad û çîn" panelek hate lidarxistin.

Di panelê de Selma James axivî û got ku ew xwe weke parçeyekî çîna karkeran dibînin û wiha berdewam kir: "Em ne zilam bûn. Me yê îdeolojiya xwe jî nîqaş nedikir. Me yê bi awayekî şênber jiyana xwe binêra û analîzeke serbixwe bikira."

James diyar kir ku ew ji zilaman xizantir bûn û ji wan bêhtir dixebitîn. Gelek cara weke karker jî nedihatin qebûlkirin. Dema ku dixebitîn hem zarokên xwe xwedî dikirin û hem jî hevserê xwe, cîranên xwe û hemû cîhan xwedî dikirin. Lê karê ku dikirin jî weke kar nedihat naskirin û heqê keda xwe jî nedigirtin. Jamesê di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Divê me jinên ku dixebitin careke din bida naskirin. Me rêxistinên xwe ava kir. Ji bo anîna zarokan û xwedîkirina zarokan me pere xwest."

Jamesê got ku wan di encama xebatên xwe de hatine asteke û di vê nêrînê de jî nekuştin û mirin, jiyan hebû.

Di panelê de Nîna Lopezê bal kişand karkerên seksê yên li Îngilistanê û got ku ew dixwazin ev weke sûc neyê dîtin.

Her wiha di panelê de Maggie Ronayne jî bal kişand li ser neteweperestiya li Îrlandayê. Ronayneyê got ku wan jî weke kurdan gelek bûyerên trajîk jiyane û wiha berdewam kir:

"Em rastî cînayetên komî, komkujî, tecawîz, bi zorê koçkirinê û dizîtiya eraziyan hatin. Wan tiştan kurd ne ku li vî welatê dijîn jî baş dizanin." **STENBOL**

## 'Şîdeta li hemberî jinê berdewam e'


Li gorî îstatîstîkên Rêveberiya Pêşveçûna Şîdeta li Dijî Jinan, tenê di sê mehan de, li sînorê Parêzgeha Silêmaniyê 290 bûyerên şîdeta li hemberî jinan hatine tomarkirin.

Di civîneke çapemeniyê de Rêveberê Pêşveçûna Şîdeta li Dijî Jinan Komîser Kemal Ebdulla wiha got: "Li gor îstatîstîkên sê mehên borî, şîdet zêde bûne. Ji ber hinek pirsgirêkên me yên zagonî hene em nikarin karên xwe pêşve bibin û vê asta şîdetê kêm bikin."

Ebdulla di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Cîhazên me yên pişkinîna DNA'yê nîn in. Ger dozeke bi vî awayî hebe, em neçarin bi mebesta pişkinînê bişînin Bexdayê." Her çiqas Rêveberiya Şîdeta li Dijî Jinan heye jî, lê makeqanûneke wan tuneye ku bikaribin li gorî wê karê xwe bikin.

Li aliyê din jî Berpirsê Beşê Jimar û Şîdeta li Dijî Jinan Milazim Hêmin jî daneyên sê mehên aşkere kir û wiha got: "Di meha tebaxê de 100 bûyer û di meha îlonê de jî ev hejmar bûye 79. 112 bûyerên şîdetê tenê li sînorê Silêmaniyê ye. 6 bûyerên kuştinê, 16 bûyerên şewitandinê û 98 bûyerê tehdîdê hatine tomar kirin. Her wiha 15 rewşên tecawîz, 16 derman xwarin, 92 şîdeta fîzîkîû di heman demê de rewşeke revandinê jî çêbûye." **SILÊMANÎ**

## Jinên TMMOB'ê kêşeya kurd nîqaş kir




Komcivîna Endezyar, Avasaz û Plansazên Bajar a Jinan a TBBOM'ê de pêşniyara, "Bila TMMOB di warê çareseriya pirsgirêka kurd de roleke aktîf" bilîze bû sedema nîqaşê.

Komcivîna Endezyar, Avasaz û Plansazên Bajar a Jinan a TBBOM'ê di roja duyemîn de jî berdewam kir. Di rûniştinên îro de "Rêxistinbûna jinên palansazên bajar, avasaz û endezyar" û "Nirxandina komcivîna jinan" hatin nîqaşkirin. Di beşa rêxistinbûnê de encamname hate nîqaşkirin. Jinan pêşniyar kir ku di encamnameyê de îbareya, "TMMOB ji bo hewceyiya tevgera jinê ya di nav saziyê de û armancên rêxistinê manîfestoyekê amade dike", "Ji bo li bajarên kurd xebat bi rihetî bê kirir];in, divê şerê tê meşandin di zûtirîn demê de bê rawestandin" û "TMMOB ji bo çareseriya pirsgirêka kurd rolek aktîf digire" cih bigirin.

Bi taybetî hind beşdarên ji bajarên tirkan bi hinceta eleqeya wan bi mijarê re tune ye li dijî pêşniyara, "TMMOB ji bo çareseriya pirsgirêka kurd rolek aktîf digire" derketin. Li ser vê yekê Endama Lijneya Rêveberiyê ya Odeya Endezyarên Ceyranê ya Amedê Sorgul Aytek bi bîr xist ku di Lijneya Giştî ya TMMOB'ê de di sala 1998'an de ev biryar hatiye girtin û xwest ku di encamnameyê de jî cih bigire. Aytek diyar kir ku li Navçeya Licê ya Amedê xebatê dimeşîne û wiha got: "Hûn nizanim em di nav kîjan şertan de dixebitin. Ez bûme şahidê bedena perçebûyî ya Ceylan Onkolê. Ji bo şerê li wir bê fam kirin divê bê dîtin. Divê pêşniyar di encmanameyê de cih bigire." Komcivîn dê bi nirxandina komcivînê dawî bibe. **STENBOL (DÎHA)**

www.arsivakurd.org

# ROJEV

**Azadiya Welat di pêvajoya qaşo çareseriyê de hate girtin. Lê dîsa jî rojeva rasteqîn eniya azadîxwaz kutan çavê wan. Îro jî CHP li kirinên xwe yên 80 sal berê mukir tê, weke ku cîhaneke nû kifş bikin guhên hinek kesan bel dibe**

ADIL QAZÎ

Tu bi xêr hatî dengê azadiyê, Rojeva rasteqîn, Rojeva me kurdan, Rojeva gel…hwd. Her ku dengê me bibirin wê hê bi hêztir derkeve, bilindtir derkeve. Geh nameyên veşartî yên leşkeran, geh di dadgehan de skandal, êvarê digirin sibê berdidin, qaşo paqijiya roviyên sîstemê dikin! lê vala ye. Îro jî CHP li kirinên xwe yên 80 sal berê mukir tê, weke ku cîhaneke nû kifş bikin guhên hinek kesan bel dibe. Ew jî ji xwe re rojev derdixin! Azadiya Welat di pêvajoya qaşo çareseriyê de hate girtin. Lê dîsa jî rojeva rasteqîn eniya azadîxwaz kuta çavê wan.

**Bila nexşeriya Ocalan bê aşkerekirin**

Di pêvajoyeke ku gelek alî rêbazên çareseriyê nîqaş dikirin de, serokwezîr pêşûpaş diaxivî, dîsa ji Giravê şewqa hêviya jiyanê bilind bû. Nexşerêya çareseriya rasteqîn hat pêşkêşkirin. Ku her alî bi awayekî hesas û bê gotin pêdiviyên wî pêk bianiya. Lê sed mixabin, weke ku tê zanîn sê meh bi ser de derbas bûn hê jî rayedarên dewletê rista padîşayê kerr dilîze, dilê wî tuneye ku nexşerêya Rêberê Gelê Kurd bi awayekî wêrek ji raya giştî re ragihîne. Her ku diçû şêlotî, nediyarî, alozî her wiha tarî û bi xwe re bêhêvîtî dianî. Rewşeke nediyar hate afirandin. Dîsa bar kete ser Mirovê Mezin û rista xwe lîst. Weke her hemleyên xwe dîsa raya giştî, rojeva Tirkiyeyê û pê re ya cîhanê arasteyê pirsgirêka herêmê, kêşeya kurd bû.



Xeyalên muebet/ Xezên li ser tecrîd û girtîgehê

ROJEV

# Ji bo CHP'ê qetl û xwîn rewa ye

Di belgeya fermî de 'infaz' heye

Ji girtiyan re name şandin

Di jêrhişa CHP'ê de qetla kurdan

Di Bienallayê de rêberên şoreşan

Kerkûk dilê Kurdistanê ye

Bi girseyî tên pêşwazîkirin

**Qasidên Aştiyê**

Bi pêngaveke dîrokî Serok Apo rayedarên dewletê û hinek derdorên din şoke kir. Weke erdhêjekê deng veda. Banga hatina sê koman; ji qada çiya, Mexmûr û ji Ewropayê kir. Tevgera Azadiyê heman demê bersiv da, ji çiya û ji Mexmûrê bi giştî 34 Qasidên Aştiyê di 20'ê cotmehê de, di deriyê Xelîl Brehîm re ketin tixûbê Tirkiyeyê, an jî bakurê Kurdistanê. Tenê di tixûbê welat de na, ji Hewlêrê heta Paytexê Dilan Amedê bi coşî, şahiyeke bêhempa, weke ava Zapê lehiya gel ber bi Bakur ve, ber bi rojavayê Tirkiyeyê ve herikî.

**Tirsa Enqereyê ji aştiyê ye**

Li Amedê ku asta pêşwazîkirina Qasidên Azadiyê gihîşte lûtkeyê Enqere bizdiya! Aliyekî daxwaziya ji bextewarbûna gelê kurd, aliyê din jî bêtehamuliya ji rêkûpêkbûyîn–disiplîna gelê kurd tirsiyan. Xof kete dilê sîstemê. Lewra vînek derketibû holê. Diviyabû vê reş bikin, serobino bikin. Lewma ku pêwîst be em ê vegerin serî! Bûn asteng ji bo hatina koma ji Ewropayê bê. Yanê ew çendekiye ku qala çareseriyê dikirin esas rengê xwe yê resen derxiste holê, diranê xwe yê bi xwîn qîç kir…pê re dê bi navê qaşo Onirekî derketa û ew kirinên destpêka avakirina Komarê pêk hatibû li xwe mukir bihata. Bi wî awayî vegera wan a 'serî' jî eşkera bû ku rêbazê çareseriya wan a pirsgirêka kurd çi ye.

**AKP jî ne kêmî CHP'ê ye**

AKP jî dixwaze ji vê yekê sûd wergire. 'Binêrin, hê ji min xedartir jî hene, ku bi carekê dixwazin qira we kurdan rakin. Dîsa AKP bi rehm e. Kujerê rasteqîn derkete holê û hwd'. Weke kesê bêar bi vê rewşê dikene.

Çawa ew tevkujiya Geliyê Zîlan, Agirî, Dêrsim- Qoçgirî û her bihusteke li vê xakê pêk anîn, çendî kujer û li hember mirovahiyê gunehkar-sûcdar in, her wiha yên ku wan kujeran xelat dikin jî herî kêm ew qas tawanbar û xwedî guneh in. Wê pîlota ku bi hezaran (jin û zarok tê de) mirovan bi balafirê, di rojekê de qetil kir, kî wê serjêkerê (qesab) qaşo jinê xelat kir? Navê wê li balafirgeha mezin, ya navneteweyî, Stenbolê kir, qaşo 'nemir' kir? Dîsa ew kujerê sî û sê (33) mirovan, ku di dîrokê de bi bûyera 33 guleyan tê zanîn. Qesabê Geliyê Zîlan Mistefa Muglalî kê navê wî (li gor xwe) nemir kir? Hê gelek mînakên welê vê hikûmeta AKP'ê hene. Ew çax, qaşo Onir çiqas sûcdar be ev AKP jî ew qas sûcdar e. Lê bi rastî jî êdî dema wê ye ku li Rojhilata Navîn jî şaristaniya hêjayê gelên vê herêmê were bicihkirin û her tişt li cihê xwe rûne. Rojeva gel pêk were.

Êdî bes e, dest ji van lîstikên qirêj berdin. Hûn qala aştî û çareseriyan dikin lê di asta herî bilind de ji bo tesfiyekirina Tevgera Azadiya gelê kurd bi hêzên navneteweyî, nemaze jî bi DYA'yê re dek û dolaban bigerînin! Hûn ji bo dilê rayedarên Ewropayê xweş bikin li ser navê rakirina tecrît û îzolasyonê çend hevalên din jî bixin wê qebra kûr. Ku ji ya berê tarîtir e û hûn ê bibêjin 'vaye me açilima xwe pêk anî!' Ev hevîr zêdetir tirş dibe. Berî ku ji teştê derneketiye divê bê helkirin (gilokirin) ku bê pehtin. Naxwe bi rojevên sexte, pûç dem derbas nekin wê çêtir be. Bi hêviya Rojevên rast, xweşî û şahiyê. Tu her bijî Rojev pasavanê Azadiya Welat.


# Xwendin, zanîn, civak û akademî

MÎRZA RONÎ

Gelê qedîm; gelê kurd dîroka xwe ya afirîner û zanistî tê nasîn, di nava rûpelên dîrokê de; bi afirîneriya xwe gelek pergalên mirovahî dane avakirin. Lêkolînên kolandinê ên li mezrabotan hatî kirin, li ser kerpîçên herî hatiye dîtin ku; di dema sumeriyan de li dibistanên yekemîn, têkiliya şagirt û mamoste li dibistanê çawa bû û perwerde çawa dihat dayîn û dîsa şagirt li mal çawa spartekên xwe di ser kerpîça dinivîsî. Li dîrokê hatiye dîtin (lêkolînên li bajarê sumeriya Şurûpak di sala 1902–1903'ê de hatî kirin, kerpîçên perwerda dema B.Z. 2500 de hatine dîtin)*. Bi van lêkolînên li ser erdnîgariya mezrabotan hatîn kirin, gelek çand û hunera kurdan derketiye ser erdê.

Dîsa beriya niha çarsed, pençsed salan gelê kurd bi wêjeya xwe li nav gelan xwe kifş kiriye ku gelê zanînê ye. Mele Ehmedê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî felsefevanên zimanê civaka xwe bûn. Dîsa Îsmaîl Ebûl-îz El Cizîrî (M.1153-1233(548-6309)). Zanyarê bavê Mekîneya dihat nasîn. Bi zanîna xwe gelek mekîneyên avê, perwane, qulf (kîlît) û mekîneyên hesaba wek kumpiter wê demê bêderfet de afirandin û navê Mucîdê Mekîneyan li xwe kir.

Ev gelê ku malevanî ji gelan re kirî û bi zanîna xwe ji pêşketina gelan re bû afirîner; ku em ber bi dîrokê heta niha werin em ê bibînin ku ev gel îro ne li gor dîroka xwe; cihê xwe li nav gelan girtiye. Berî her tiştî ev gel di bin lingê dagirkeran de hate perçiqandin û mafê wî yê herî mirovahî jî jê hat standin.



> Kurd divê di warê zanîna siyaset, dîrok, felsefe û warê fîzîkê û matamatîkê de bi her awayî bên perwerdekirin. Perwerde ji civaka re pêşeroja serkeftinê ye

Gelo çi bû ku ev gel wisa berevajî bû û ji her tiştî hate qutkirin. Mirov ber bi vê pirsê de here mirov dê rehetî bibîne ku ev gel kaniya ava xwendin û zanînê jê hate birîn. Nemabû ku êdî ev gel xwe bi zimanê xwe yê zanînê pêş bixe û di nav gelan de felsefeya xwe biafirîne. Pergalên dagirkerên serdest ew cewhera ku di nava gelê kurd de a zanînê û ronahiya civaka kurd didît û ji wê sedemê kaniya xwendina li ser vî gelî birîne. Zimanê wî, çanda wî, dîroka wî li ser birîne û xwendin û zanîna xwe lê ferz kiriye. Tu gel nikare perwerda gelekî li ser xwe bigire û hebûna wî têxe bin pergala xwe. Heke wisa bû wî demî ew gel jî dikeve nav pergala pişaftin û xwepişaftinê. Ku em bifikirin heke dema dîroka nêzîk de komara desthilatdarên gelê kurd hatî damezrandin û kurd li ser axa xwe bûn çar parçe ku wî demî gelê kurd ji zimanê xwe û mafê perwerdeya xwe qut nebûya û heta niha vî gelî bi zimanê xwe perwerdeya xwe bikira. Ji felsefeyê bigirin heta matematîkê ji wêjeyê bigirin heta fizîkê heke ku gelê qedîm bi zimanê xwe di nava civakê de perwerdeya xwe bikira; wî demî îro ew çanda ku em dibêjin pêşengiyê ji gelan re dike çanda ewropî dê li me kurdan temaşe bikirane. Lê dîsa ev gelê qedîm bi saya şoreşgerên Tevgera Azadiya Gelê Kurd; ev gel ji ber bi windabûnê şiyar kirin û bi îlmê sosyalîzmê ciwanan pêşengî ji têkoşîna gelê kurd re kir û bi felsefeya zanînê şoreşek afirand. Her yek ciwanê Apocî zanîngeh dixwendin û rastiya vî gelî ya di nava dîrokê de fêm kirin û ji vî gelî re bêhtir xwe dan îlmê zanînê û heta îro ev gel ber bi mafê pergala komfederalîzmê anîn.

Îro ev gel divê di warê zanîna siyaset, dîrok, wêje, çand, felsefe û warê fîzîkê û matematîkê de bi her awayî bê perwerdekirin. Perwerde ji civakan re pêşeroja serkeftinê ye. Divê civaka me herî kêm ji sedî heştê xwenda be.

Gelo em ê îro li gor rewşa ku civaka gelê me tê de; em ê çawa bikin ku civakek afirîner, xwenda û zane derkeve holê. Em ê çawa bikaribin siyasetmedaran, rewşenbîran, civaknasan û zanyaran derînin ji nava vî gelî. Berî her tiştî em ê çawa bikin ku ziman û wêjeya vî gelî ji bin lingê dagirkeran derkeve û pêş bikeve. Em dikarin bêjin me rewşenbîr hene, siyasetmedar hene, xwenda hene lê mixabin; em nikarin bêjin ku me civakek ji sedî heştê di warê xwendin û zanînê de pêşketî heye. Gelo çima em nikarin bi hezaran pirtûkên kurdî bifiroşin. An jî çima em nikarin bi hezaran rojname û kovara bifiroşin? Ji ber ku îro me civakeke xwenda pêş nexistiye. Xwendina ku civaka me xwendî jî (em tevgera azadiyê gelê kurd jê derxin) xwendina ku serdesta dayî me ye. Siyasetmedarên me bi zimanê serdestê xwe hînî siyasetê bûne. Ne zimanê civaka kurd e. Ne ya ku me li gor zimanê civaka xwe xwendiye. Dema mirov bi zimanê xwe diaxive û dixwîne mirov rewşa xwe û fikrên xwe bêhtir dihise. Axaftina zimanê biyanî wek guleya keleşkofê be; a zimanê mirov wek guleya dokçayê ye. Bêhtir di tesîr dike, bandor dike.

Gelo em ê çawa bikin ku civaka gelê kurd xwe ji bindestiya perwerdeya serdestên xwe derxe. Yek; Pêşniyara birêz Ocalan a avakirina akademiyan e. Divê di akdemiyan de bi sedan-hezaran pêşengên gelê kurd bên perwerdekirin. Gel bê perwerdekirin, mamosteyên ku perwerde û hîndekariyê bidin gel bên gihandin. Akademî ne ew e ku bîst rojan an jî heyvekê perwerde bê dayîne û hew. Akademî cihê zanîn û lêkolînê ye. Bi salan ev kar didomin û di nava civaka xwe de lêkolînê bi her awayî dike. Ziman, wêje, dîrok, civak, felsefe û hw. Lêkolîn li ser van tên kirin. Akademiya jinê, akademiya siyasetê, akademiya ziman û akademiya dîrokê îro ji me re ferz in. Û şûna bi tirkî "kendînî bîl" bi kurmancî "xwe binase" ango divê em xwe bi kurdî binasin ne bi tirkî.

Gavek dî jî heye ew jî em bikaribin girîngiya xwendinê di nava gel de belav bikin, hişmendiya xwendina zimanê zikmakî û giringiya ziman em bikaribin bidin gel. Bila di her mala kurd de bi sedan pirtûkên kurdî hebin û di her malbatê de bila xwenda hebin. Îro li gelek navçeyên me cihê pirtûkfirotinê tune ye. Çima gelo? Di gelek şaredariyên me de pirtûkxane tune ye, çima gelo? Îro dem dema xwendin, zanîn û pêşketinê ye.

** Pirtûka Dîrok li Sumerê dest pê dike r.21 dibistanên yekemîn*

www.arsivakurd.org

## Piştî 50 salan Camus dîsa tê nîqaşkirin

Wêjevan Albert Camus piştî 50 salan dîsa bû mijara nîqaşan. Alber Camus di sala 1957'an de xelata nobelê wergirtibû. Serokwezîrê Fransayê Nicolas Sarkozy xwest ku gora Albert Camus bibin gora Pantehonê ku ev goristana rewşenbîran e lê ev xwestek ji aliyê kurê Camus ve hat redkirin. Jean Camus ji bo redkirinê wiha got: "Birina gorê ya Pantehonê ji bo nivîskarekî pirtûka bi navê 'Mirovê Serhildêr' nakokiyek e." Beriya niha jî gora nivîskar André Malraux û Alexandre Dumas li cihekî din biribûn Pantehonê. Li gorî nûçeya rojnameya Le Monde kurê Camus, Jean Camus li hemberî xwesteka Sarkozy derdikeve û keça wî Catherine Camus bê biryar e. PARÎS

# Li Îzmîrê mezûnan sertîfîka wergirtin

**Şaxa Îzmîrê ya Kurdî-Der'ê bi merasîmekê kursiyerên xwe yên zimanê kurdî mezûn kirin. Di merasîmê de 32 kursiyerî sertîfîkayên xwe girtin û li ser giringiya ziman hat sekinandin**



Şaxa Îzmîrê ya Kurdî-Der'ê bi merasimekê 21 jê mamoste 32 kursiyerên xwe mezûn kirin û sertîfîkayên wan bi merasîmekê belav kirin. Di merasîmê de Parlamentera DTP'ê ya Şirnaxê Sevahîr Bayindir, ji ber xwedîlêderneketina kurdî rexneyên tûj kirin û wiha gotin: "Şerm e ku mirov ji yekî re bêje li zimanê xwe xwedî derkeve, zimanê xwe biaxive."

Merasîm li Komeleya Çanda Mezapotamya hate lidarxistin û gelek kesên wekî Parlamentera DTP'ê ya Wanê Fatma Kurtulan, Parlamantera Şirnexê Sevahîr Bayindir, Serokê Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê Samî Tan amade bûn. Di merasîmê de piraniya jin û zarokan bal kişand. Merasîmê bi rêzgirtinê dest pê kir û sînevizyona li ser xebatên zimanê kurdî û dîmenên nivîskar û rewşenbîrên kedkarê zimanê kurdî û rojnameyên kurdî hate pêşkêşkirin. Di merasîmê de zêdetir li ser girîngiya ziman hate rawestandin.

**'Me tiştekî wiha xeyal nedikir'**

Di destpêkê de Serokê Komeleyê Mustafa Borak axivî û bang li hemû kesî kir da ku ew li zimanê xwe xwedî derkevin. Borak, mezûniyeta zimanê kurdî û merasîma ku li dar xistin jî bi gotinên wekî "Rojeke dîrokî" bi nav kir û got ku çend sal ewil tiştekî wiha xeyal jî nedikirin. Borak derbirî ku zimanê kurdî hêdî hêdî digihêje resmiyetê û bang li hemû kurdan jî kir ku ji bo vê yekê amedekiriyan bikin. Borak der barê hişmendiya kurdî de jî bi taybetî saziyan kurdî bi gotinên wekî "Hin saziyên me hîn tênegihîştine girîngiya ziman" rexne kir û xwest ku di serî de saziyên çandî û ên ku xebatên ramanî dimeşînin divê giraniyê bidin kurdî. Borak da zanîn ku wan di konferansa xwe de tespîta "bi xebatên me hindik be jî asîmîlasyon hatiye rawestandin" kir û got ku ev agahiya kêfxweşiyê ye û wiha domand: "Lê divê em asîmîlasyonê têk bibin. An dê asîmîlasyon ziman biqedîne an jî dê ziman asîmîlasyonê biqedîne."

**Ziman bi sînor dikin**

Piştî Borak, Parlamentera DTP'ê Bayindir derket ser dikê û ji ber helwesta li hemberî ziman rexneyên tûj kirin. Bayindir got "Ez ji beşdarbûna xebatên ziman kurdî pir kêfxweş û bextewar dibim. Ji ber ku bi tenê ancax dikarim kêfxweşî, dilgermî û xemgîniya xwe bi zimanê xwe bidim der. Lewma zimanê tirkî ji bo min zimanek pûç e" û piştre jî wiha domand: "Lê kurdî di şexsiyeta me de berjewendiya xwe winde kiriye. Şerm e ku mirov ji yekî re bêje bi zimanê xwe biaxive li zimanê xwe xwedî derkeve. Jixwe ar jî bi me re nemaye. Kesên ku bi zimanê xwe nizanin bila ji kerema xwe re nebêjin ez kurd im." Bayindir, li ser helwesta dewletê ya li hemberî kurdî jî sekinî û got ku ziman di kursan de nayê hînkirin divê zimanê kurdî fermî bibe. Bayindir wiha got: "Lê dewlet li hemberî zimanê me sînoran datîne. Dibêje li mala xwe biaxivin lê li filan derê neaxivin, ewqas biaxivin evqas neaxivin. Helbet kurd vê yekê qebûl nakin em jî ji ber ku ziman bibe fermî li meclîsê xebatên xwe didomînin." Piştî axaftinan şano hate lidarxistin û 21 jê mamoste 32 kursiyeran jî sertîfikayên xwe girtin. **ÎZMÎR - DÎHA**

## Li Agiriyê panela ziman pêk hat

*TZPKurdî* li Agiriyê panela "Zimanê Zikmakî û Kurd" li dar xist. Di panelê de hate gotin ku gelê kurd bi têkoşîna xwe zimanê xwe li ser rûyê cîhanê belav kiriye û kurdî ji mirinê rizgar kiriye.

Panel li avahiya Komeleya Xwendekarên Zanîngeha Agiriyê pêk hat. Endamê Koordînasyona TZPKurdî Serdar Balci û Nivîskarê Kurd Hamît Dilbihar wekî panelîst amade bûn. Di panela ku piraniya xwe ciwan amade bibûn de Nivîskar Hamît Dilbihar li ser girîngiya ziman û rewşa kurdî axivî. Dilbihar, diyar kir ku parastina zimanê zikmakî parastina rûmetê ye û wiha got: "Kurdî bi tevgera kurd kete rojeva cîhanê. Tevgera kurd kurdî ji mirinê rizgar kir. Kurdê ku ji bo kurdî têkoşînê nemeşîne di kurdewariya wî de pirsgirêk hene. Çawa ku pişaftin sûcê mirovahiyê ye, pişaftina xwe bi xwe jî sûcê mirovahiyê ye."

Endamê Koordînasyona TZPKurdî Serdar Balci jî bal kişand ser girîngiya fêrbûn û hîndekariya zimanê zikmakî û da zanîn ku kesê bi zimanê dayika xwe perwerde nebe kesê bê ruh e. AGIRÎ



Kakşar Oremar
kakshar_oremar@yahoo.de

## Qazî Mihemedê vê sedsalê!

Kes nizane wê şeva reş sîtemkar û cinayetkaran Êhsanê qehreman bi çi awayî îdam kirin. Ji xeynî tîma îdamê kes agahdar nîn e ka di wan çaxên hesas de Êhsanê evîndarê kurd û Kurdistanê çawa li hemberî celadên Tehranê axiviye û çi gotiye. Xwezî zimanê dîwarên zindana Sine hebûya ka dê çawa behsa wê şeva reş bikira û tabloyê berxwedana Fetahiyan çawa dixemilandin.

Xeber pir nexweş û hemû hewldanên raya giştî, saziyên sivîl û kurdên cîhanê nikarîn Îranê razî bikin ku ji ya xwe bê xwarê. Ev karê hovane belgeya nasandina nasnama **'komara wehşet'** û **'sîstemeke totalîter'**. Guneha Êhsan ew bû ku endamê komelê bû. Di tu zagonê de nehatiye dîtin ku karekî wiha bibe sedema bidawîanîna jiyana kesekê. Di orfa siyasî û hiqûqî de kesek bi tawana endamtiya rêxistineke siyasî nayê îdamkirin.

Nameya Êhsan û naveroka wê ya tijî mesajên siyasî-dîrokî tu riyeke din li ber dagîrkerên ecem nehiştibû. Nameya ku dikare weke **'wesiyetnameya qehremanekî'** bê binavkirin. Tenê gotin û nêrînên Êhsan di vê namê de bes in an jî dihêlin ku em wî weke **'sembol û qehremanekî milî'** binav bikin. Nameya ku dilê rayedarên Îranî lerzand û felsefa wan ya pûç û vala qenctir bi hemû kesên xwedî wijdan re da nasandin. Rayedarên Îranê xwedî cesareteke wiha mezin û exlaqî nîn in ku şêre xortekî weke wî azad bikin an jî hukmê îdama wî îbtal bikin. Nameya wî **'manîfestoyeke nû'** ye bo hemû kurdan û dengekî bilind bo tirsandina hikûmeta nameşrû ya Îranê di van 30 salên dawî de.

Sal 1947 bû. Dadgeheke leşkerî li Mehabadê Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî mehkeme dikirin, lê Qazî Mihemed bû ku rejîma şahenşahî û generalên rûniştî li wir mehkeme dikirin. Ew tev bûn yek û pêşewayê kurd jî bi tena serê xwe wisa axivî ku hemû sosretgirtî mabûn. Wesiyetnama Qazî û nameya Êhsan vê rastiyê ji me re didin îspatkirin ku Êhsan xwîndevanekî mekteba Qazî ye. Êhsan bi têgehiştin, sewya bilind a rewşenbîrî, dûrbînî û Qazî Mihemedê vê sedsalê. Ji ber wê jî Êhsan weke Mazlum Dogan, Leyla Qasim, şehîd Aram, Kemal Pîr û hwd bû sembol û qehremanekî millî. Şeref û serbilindiyeke wiha jî zû-zû di jiyaneke wiha kurt da nabe para her kesî.

Şehîdkirina Fetahiyan careke din çend rastî û heqîqetên dîrokî ji me re aşkera kirin:

*1.* Dîktator û hikûmetên totalîter her tim bi tirseke mezin li beranberî îrade û daxwazên gelên bindest tev digerin û ditirsin. Ew xwe ji ronahî û rastiyan vedişêrin û vedidizin. Îdam û kuştina azadîxwazan çi sûdek nabe bo dirêjiya temenê **'komara wehşetê'**, gel û dijberên vê sîstemê bi cesaretir dikevin.

*2.* Ji me kurdan re bêhurmetiya herî dawî ji hêla dewleta Îranê mesajeke gelek watedar bû: Dema em xwedî kiyan an jî hêlîneke serbixwe nebin, jiyana me jî yê wiha erzan be.

*3.* Nasnameya siyasî û ramanên girtiyên sîyasî li rojhilatê Kurdistanê xaleke hevpar têda ye. Ew tev ji bo mafê kurd û çereserkirina pirsgirêka kurd hewl didin. Ger wihaye bila kurd û rêxistinên siyasî li Rojhilat hev bigirin. Bila ji şîret û gotinên Êhsan şerm bikin û dest ji netifaqiyê berdin. Îro roj ne ya ji hev veqetînê, dem û çaxa hevgirtinê ye.

*4.* Hemû dinya li dijî îdama Êhsan bû, lê vî karê rayedarên komara qaşo îslamî kakilê qanûnên hikumeteke îslamî jî ji me re eşkere kirin. 'Îslam'ek ku divê di hemû zagonên wê de reformên bingehîn bêne durist kirin.

*5.* Îdama Êhsan weke întiqam û tehqîreke mezin bû li dijî hemû kurdan. Dadgeha yekê ew bi 10 sala mehkum kiribûn, lê dema ku wî li hemberî daxwazên wan li berxwe da û nekarîn bi darê zorê wî bînin ser riya xwe jêra gotin 'ger wa nekî emê te îdam bikin'.

*6.* Bav, dê û malbata Êhsan gere bizanin ku ew tenê kurê wan nîne, belkî bi karekî wiha re bû qehremanekî netewî û dîrokeke tejî serbilindî. Wî riyeke nû li ber me vekir ku hemen riya Qazî Mihemed e.

Kurê dayika şîr helal Êhsan tenê ji me dixwazek heye: **"Tola xwîna min ji cinayetkarên sedsalê bistînin…"**

# BÎRANÎN



**Sezaî Karakuş (Mazlûm Tekman) 1978 2004**

*Ez deng im, deng...*
*Dengê gelê xwe!*
*ji ber zilmê min serî hilda*
*Têm ji Agirî ji Xerzan*
*Rêwî me diçim*
*Qendil û Cûdî û Zagros*
*Riha û Amedê*
*Ji erdê min xwe da*
*erşê ezman*
*Gehîştim Botanê û Şirnexê*
*Dibim birûsk*
*li ewran*
*dibin tav*
*Şûnda vedigerim*
*koxê Bîngolê*
*Şûşar û Tekmanê*
*Kanîreşê*
*Erzeromê*
*Gimgim û Xinisê*
*Çavresî*
*Şerevdînê*
*Qertalegê*
*yanî Serhedê*
*Ez xîret im xîret*
*xîret tu zilmê qebûl nake*
*Min ar û namûs jî*
*ji xwe re rakir*
*Seref û hesiyet*
*bûye para we*

*Bêxîretî li ba kurdan nema*
*Me kir mezelê*
*ew mir*
*Para xwe wek biran*
*tu jî, ji erdê rake*
*Bi eniya pak*
*Bi serê bilind*

*Ez gerîla me, gerîla...*
*Kaniya laser û birûskê*
*Nav û nîşana min*
*ne diyar e*
*Wek taviya teyrokê*
*Têm ji ezman*
*geh li virê*
*geh li wirê me*
*Ez im çeperê Kurdistanê*
*hêviya kurdan*
*Ez tolhildam û kîn im*
*Mirina mirinê*
*mêvanê felekê*
*siwarê xezeb im*
*Ji gelê mazlûm re*
*azadî û serxwebûnê tînim*

*Ez dengê we me*
*dengê gelê xwe*
*şêrê çiyan û zindananî*

**Li ser navê malbata wî Ahmet, Muhsîne, Muzahît, Şahap, Mutahîr, Azad, Mazlûm, Aslihan, Bedîha, Songul, Bîrgul, Rûken, Hêja, Umut Baran, Tenzîle, Nur, Berfîn Ceren**

## 'Penaberê Parîsê' xelat wergirt

Fîlmê "Penaberê Parîsê" (Paris d'exil) ya aktor û derhênerê kurd Ahmet Zîrek, li Festîvala Navneteweyî ya Fîlman a Qahîreyê de hat xelatkirin.


Fîlmê yekem ê Zîrek, di "beşê fîlmên dîjîtal" yê pêşbirkeya Qahîreyê de xelata zîvîn (duwem) wergirt. Hunermendê kurd, xelata xwe di merasîmeke li paytexta Misirê de wergirt. Li 33'yemîn festîvala navdar a Rojhilata Navîn de, fîlmê bi navê "The Rapture of Fe" ya Alvin B. Yapanê filipînî xelata zêrîn wergirt.

Ahmet Zîrek, ji bakurê Kurdistanê ye û penaberiya xwe ya zêdetirî 25 salan di vî fîlmî de vedibêje. Ew kurê xwe dişîne bajarê xwe, Culemêrgê, ku bapîrê xwe bibîne. Bi vê serêdanê bav û kur hev du nas dikin û dema berê tê bîra Zîrek ka ew çawa sala 1980'yê ji Kurdistanê derket û li Fransayê bû penaber.

Zîrek heta niha di fîlmên derhênerên navdar ên mîna Yilmaz Guney, Costa Gavras, Sally Potter û Jean-Luc Goddard de û bi aktorên wek Isabella Adjiani, Monica Belluci û Johnny Depp re lîstiye.

Hunermendê kurd, piştî weşandina kitêba xwe ya bi navê "Bihizire ku..." yekemîn fîlmê xwe "Penaberê Parîsê" çêkir û ew diyarî diya xwe û Guney kiriye. Fîlma Zîrek, berî niha jî, meha tîrmehê, li Festîvala Navneteweyî ya Parîsê hatibû nîşandayîn. **PARÎS**











DR. DILGEŞ
dilges_dilges@hotmail.com

## Weşana 24 saetî ya bi kurdî

Gelî dostan, vê pêlê qelebalix û hengameya berveçûna doza kurdî di bin siya nesaxiya berazan de toz ji meclîsa tirkan rakir.

Wekî hûn jî dibînin, her roj li ber ekranên tvyan gef û qîreqîra siyasiyan li ber perên asîmanê heftê dikevin.

Li aliyekî, CHP dûvê xwe gez dike û bi devê Onur Oymenê serpîvaz dibêje, "Kurdê herî baş kurdê mirî ye" û li aliyê dîtir weşana 24 saetî ya kurdî di tv û radyoyên taybet û herêmî de jî serbest dibe û rê li ber vê vedibe.

Ê, çavên me ronî, êdî em dikarin bê jêrnivîsa bi tirkî bi dilekî rehet weşana bi kurdî bikin, lê…

Aha, mesele hemû ev 'lê' ye, gava ku mesele hat û di 'lê' de asê bû, bizanibin ku li wê derê serêşanek heye û hewcehiya wê jî bi çare û dermanekî bi lez û bez heye.

Erê, bi serbestkirina weşana 24 saetî bazara kurdî geş dibe û deriyên nû yên nanê bi kurdî vedibin, lê…

Erê erê, dîsa 'lê'ya me hat û dewama gotinê birî.

Gelî dost û yarenan, ev weşana di bin siya şewb û nesaxiya 'lê'yan de ji bo me tenûra nanê şîvê ye, nexasim ji bo Kurdî Der û TZP'ê, ji ber ku ew êdî dikarin atolyeyên xwe yên KURDÎ DER'ê di heman demê de wekî stûdyoyên werger, dengdayîn û dublaja fîlmên bi kurdî jî bi kar bînin û ji bo pêşvebirin û geşkirina bazara bi kurdî tv û radyoyên herêmî bi kar bînin. (Li ser vê pêşniyara min bifikirin ha)

Di heman demê de Azadiya Welat û dam û dezgehên dîtir ên ku yekser û rasterast bi kurdî re mijûl in, ji îro şûnde dikarin di weşana dîtbarî û guhdarî de ji hin transferan bikin û bihêlin ku çirayê 24 saetî yê kurdî geştir û ronaktir bibe.

Bo nimûne, di Gun tv de (berî her tiştî divê navê vê tvyê bê guhartin, ji niha pê ve bibe RONÎ tv) bernameyên wiha çêbibin.

Danê sibê: saet ji 7 heta bi 10'an bernameya 'Rojbaş Diyarbekir' bi pêşkêşiya jin û mêrekî (bila kurdiya wan zelal be ha) bête pêşkêşkirin. Ji 10'ê heta 12'ê stran, rêzefîlma Marîa bi dublaja kurdiya Kurdî Derê. Danê nîvro: Ji 12'ê heta 14'ê sînema cîhanê bi dublaja Enstûtiya Kurdî ya Amedê, ji 14'ê heta 18'ê stran, govend, koçernameya Evdila Koçer (ji Almanyayê transfer bikin)

Danê şevê: Ji 18'ê heta 20'ê bernameya zindî ya Adil Zozanî bila mêvanên wî yên daîm Tayîp Temel, Emîn Yildirim û Semîha Alankuş bin û ji 20'ê heta bi 22'ê jî bernameya şevbihêrkê be û pêşkêşiya wê jî Seyîdxanê Boyaxçî bike.

Danê nîvşevê: Ji 22'ê û pê de zarokan razînin û fîlmên romantîk, fantastîk, evîntîk, eroûtîka(tîk) bi dublaja Arjen Arî û Enstûtiya Kurdî ya Stenbolê (bila ew jî nanekî ji kurdî bixwin lo) bêne pêşkêşkirin.

Heta sibê mimkûn e ev fîlm li ser bin.

Ez jî her yekşemê, saet 10 û 11:30'a danê sibê bi bernameya Doxtorê Dînan, bi awayekî yekser û zindî dê bi we re bim.

Ji bîr mekin, çareya her derdî li nik we bi xwe heye. Êdî hewcedariya we zêde bi qanalên xwerû tirkî nemaye û dema pirzimanî dest pê kiriye.

Heta gotara bê her tişt bi dilê we be!...







# XAÇEPIRS

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | ■ | | |
| 2 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 3 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 4 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |
| 5 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 6 | | | | ■ | ■ | | | ■ | |
| 7 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 8 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 9 | | | | | ■ | | | | |

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Kesê ku jehra mar dimije... Rastêşek **2.** Beyreq, sembola welatan... Heyf **3.** Notayek... Vê carê **4.** Kar û xebat... Îşaret, şop **5.** Dadwer... Cephe, bere **6.** Cînavka vegerok... Kurteya elementa Aktînyûmê **7.** Kurteya ajansa fermî a Tirkiyeyê... Beraza mê **8.** Rengek... Tiştê ku tehma wî tehlokî, tirşokî û qemitokî **9.** Hilberîna tiştekî nedîtî... Têbinî

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Şîrê kelandî yê havêynkirî... (Ehmedê …) Nivîskarê pirtûka 'Mem û Zîn'ê **2.** Teref... Cure, celeb **3.** Yezdanekî misrî... Beşeke malê, jûr... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye? **4.** Di dîrokê de dewleteke kurdan **5.** Pirtûka pîroz a ji Hz. Îsa re hatiye hinartin... Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin **6.** Cihê herandinê... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin **7.** Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê... Nepêşekar, kesê ku di kar û barê xwe de bi pêş neketiye **8.** Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Rojek... Ji bo qewirandina heywanên mîna mirîşk û qazan **9.** Bajarekî me... Notayek

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | M | A | L | ■ | E | D | Û | L | Ê |
| 2 | A | W | I | R | ■ | U | ■ | A | D |
| 3 | D | A | ■ | E | B | A | D | ■ | Î |
| 4 | E | ■ | E | N | Î | ■ | Î | Ş | ■ |
| 5 | K | A | N | Î | ■ | A | Z | E | B |
| 6 | ■ | T | A | ■ | Ê | M | ■ | K | A |
| 7 | L | Î | M | A | ■ | E | M | ■ | B |
| 8 | Î | N | ■ | E | N | T | Î | K | E |
| 9 | S | A | L | ■ | A | A | ■ | Ê | K |

# Ecevîtê hişyar

Ehmed Necdet Sezer û Ecevît li Ewropa tevlî konseyekê dibin. Dema ku dê dest bi xwarinê bikin çavê Ecevît diçe ser A.Necdet Sezer ku ha wiha li kevçiyekî dinêre. Sezer wê çaxê difikire, dibêje; "Haho ev çi kevçiyek xweşik e, wele ez vî kevçiyî ji Semra xanimê re bibim ez ê li ber çavê wê pir mezin bibim." Radihêje kevçî û dixe bêrîka xwe...

Ecevît jî difikire: "Law Rahşan xanim, dê li cem Semra xanimê bibîne dê di gora min de birî... Ew ê jî bixwaze, bise ez jî yekî têxim bêrîka xwe...

Hema li ser sifrê li ber hemû kesî zengilek biçûk heye, yên ku dixwazin biaxivin li zengilê dixin û diaxivin. Ecevît radihêje kevçî û kevçî li çanê, zengilê dikeve Ecevît jî mecbûr dibe radibe ser xwe û dibêje;

- Ji bo ku we em kirin mêvan gelek spas.

Ecevît rûdine, bêhnekî disekine û dîsa dest davêje kevçî û kevçî dîsa li zengilê dikeve, mêvan li Ecevît dinêrin, Ecevît dîsa radibe û dibêje;

-Ez ji bo mêvandariya we gelekî spas dikim û ev kevçiyên we jî pir xweşik in.

Ecevît rûdine dîsa dest davêje kevçî û kevçî dîsa li çangoçkê dikeve, vê carê bêhna wî pir teng dibe radibe û dibêje:

-Mêvanên hêja li min temaşe bikin: ez ê lîstikeke sêhrbazî pêşniyarî we bikim. Hûn vî kevçî dibînin ne wisa? Haaaa baş e, de îjar bala xwe bidin min û baş temaşe bikin, ez ê vî kevçî têxim bêrîka xwe. Min xist bêrîka xwe ne wisa? Haaaa de binêrin îjar ew ê ji bêrîka Sezer derkeve... bi wî awayî hem kevçiyê xwe dizî û hem yê Sezer ji bêrîka wî deranî…

# Derew!



Otobosek tijî siyasetmedarên tirk li Mêrdînê ji bo rayan berhev bikin digerin. Dema ku digihêjin Dêrikê şofêr li der û dorên xwe dinêre, darên zeytûnê temaşe dike lewra ji ser hişê xwe diçe û otobos diqulipe. Gundiyek jî li wir mihên xwe diçerîne; dinêre ku otobûs diqulipe, radibe diçe cem otobûsê. Dinêre ku hemû bela wela bûne, difikire û dibêje 'Bila goştê wan nekeve nav devê gur û kûçikan, ez wan binax bikim dê baştir bibe' Û hemûyan binax dike...

Çend roj derbas dibe, di rojname û televizyonan de qîreqîra wan e, li siyasetmedaran digerin. Û ya dawî pê dihesin ku gundiyekî ew binax kirine.

Diçin cem gundiyê ku ew binax kirine, jê dipirsin;

-Tê gotin ku te siyasetmedarên me binax kirine gelo rast e?

-Wîîî, belê belê. Yaw min dît ku otobûsa wan qulipî min jî ew binax kirin, min got bila nekevin nav devê gur û kûçikan.

-Ma hemû miribûn kesê sax di nav wan de tune bû qey?

-Yaw hinekan ji wan digot, em sax in em ne mirîne. Lê hûn jî dizanin bê siyasetmedar çawa derewan dikin. Çawa diçirînin!

www.arsivakurdi.org

# Li Baregehê...

EVÎN BAŞKALE

Li baregehê, ji bo ku hin heval ji peywirê hatibûn, ew hîna di xewê de bûn. Hindek heval jî hîna li peywirê bûn, nezivirîbûn baregehê. Cengo û hevalên ku bi wî re hatibûn, ji bo ku heval hişyar nebin, berê xwe dan xwaringehê. Li xwaringehê pejna hinek hevalên keç dihat, ew dengê hevalên ku xwarina hevalan amade dikirin bû. Di ketina xwaringehê de, lingê Xelef bi semuga derî ket, hindik ma ku, bi ser hevaleka keç de bikeve lê, xwe bi kotekî bi derî girt û bi ser hevala keç de neket. Xelef ji vê yekê pir şerm kir. Ji hevalên keç yek pir keniya. Hevaleke keç a dîtir, li hevala xwe ya ku dikeniya heyitand, gote wê "bê sedem çima tu ew qas dikenî? ma çi qewimî ye? Hevala keç a ku dikeniya kenê xwe qut kir, got: "heval hindik ma, bi ser min de bikeve, bêhemdê min ez keniyam, ez çi bikim kenê pexîl e, ji nişkave kenê min hat."

Hevalên keç, cih destnîşanî hevalên ku nû hatine kirin, agir gêş kirin. Hevalan xwe germ kir. Ji ber ku, bi şev rêwîtî kiribûn. Xwêdanê di pişta wan re avetibû. Piştî ku Cengo û hevalên wî xwe germ kirin bêhna xwe berdan û hal xatirê hev pirsîn hevalên keç navê xwe gotin. Navê wan; Azîme, Saadet û Evîn bû.

Azîme û Saadet pir axîvok bûn. Lê, Evîn pir şermok bû hîna pir ciwan bû.

Evîn li kêleka Bênav rûniştibû bêdeng heval guhdarî dikirin. Wexta ku dixwest peyvekê bibêje, zer dibû, sor dibû, bi kotekî peyv ji devê wê derdiket. Carinan çavên Bênav û Evînê li hev diketin, herdû jî, ji bo ku heval pê nehesin, berê xwe dizivirandin aliyekî din.

Bejna Evînê pir ne dirêj bû, levên vê tenik bûn, difna wê berve hewayê rakirîbû. Meşa wê weke Kewê bû. Di meşa xwe de hildipekî ye. Li baregehê Evîn û Bênav ne dixwestin ku ji hev qut bibin. Lê, ne bi hev re têr axivîn, ne jî têr li cem hev rûniştin.

Heval Mezlûm hate cem wan, xêrhatina wan kir, çûn destên hev, hev hembêz kirin. Heval Mezlûm gote hevalan: "îro em ê, civînekê bi dar bixin. Em dixwazin ku, bi pêşmêrgeyan re çalakiyeke hevbêş bikin. Ji ber vê yekê, me hûn gazî baregehê kirin."

Heval Cengo, ji heval Mezlûm pirsî: "heval, ev çi çalakî ye, li ku derê ye, ev cihê ku em çalakiyê pêk bînin?.."

- Heval Cengo, li hemberî gundê Avaguzê çiyayek heye, navê wî çiyayî Xantûr e. Li nav serê wî çiyayî yekîniyeke Sedam heye, dibêjin ku tofek e. Li vê derê tenê ew yekîneya heye tê gotin. Em dixwazin wê yekînê di bînî de rakin. Ev der, dibêjin bêleşker bin ji bo me jî çêtir e.

- Heval Mezlûm ev çiya pir dûr e sînor e, tu feyda û zirara xwe jî, li me nîne. Çima, em ew tabûra ku nêzî gundê Sinehtê ye ku li kêleka çemê Hêzil e em ranakin, an jî çalakiyeke li dijî wê dernexin. Ew tabûra hîna zêdetir astengiyan li pêşiya me derdixe, hîna zêdetir li pêşiya me dibe asteng, got Xelef.

- Heval Xelef gotinên te pir rast û durist in. Lê mixabin, ez jî nizanim çima em li hemberî tabûra li kêleka çemê Hêzil çalakiyê li dar naxin, li hemberî tofa ku li navserê çiyayê Xantûrê em çalakiyê li dar xin, ez jî tê nagihêjim? îro li saet neh, der heqê vê mijarê de em ê li hev bicivin. Di vê civîne de her tişt dê zelal bibe.

Li saet neh hemû heval li hev civiyan. Civîn Selîm bi rêve dibir. Selîm di destpêka axaftina xwe de, mebesta çalakiya hevbeş, anî ser ziman, gote hevalan: "piştî dîlgirtina Casim Casim, navbera me û Partiya Demokrat xira bû. Em vê çalakiyê, dixwazin ku, navbera xwe û wan dîsa weke berê bikin. Ji ber vê yekê, em dixwazin ku ev çalakiya hevbeş pêk bînin."

Hevalê Xelef destûr xwest rabû ser piyan, dest bi nirxandinên xwe kir: "pêwîst nake ku em û wan vêkre çalakiyan dar bixin. Pêwîst e ku em hêza xwe li Başûr bi çalakiyên wisa qels nexin. Ev tofê ku li ser serê çiyayê Xantûr e, li pêşiya xebata me tu astengiyan dernaxe, eger li nêzî sînorê Bakur me çalakiya hevbeş pêk baniya, di çalakiyên wisa de pir qezencên me yên hebûya. Lê ev cihê ku em çalakiyê lê dar bixin, tu feyda xwe ji bo me nîne."

Selîm, hevalê Xelef bersivand: "ev cih ku tofê Sedamê zalîm lê, ku bê rakirin, ji bo me, tu derfetan nade. Lê, ji bo gelê me yê Başûr û pêşmêrgeyan pir derfetên xwe yên hebin. Ev yekîneya bandora xwe ber bi Başûr, li ser hemû rê û rêçikan dike. Loma, em dixwazin wê tofê yan îmha bikin, an jî ji vê derê bidin revandin. Mijara herî girîng, em vê çalakiyê, bi daxwazên berpirsê Partiya Demokrat pêk tînin."

- Naxwe, ev biryar ne biryara me ye. Biryara wan e. Em jî di bin fermandariya wan de beşdarî vê çalakiyê dibin.

- Rast e, hevalê Xelef.

- Naxwe, ew me weke xwe qebûl nakin. Me kêmî xwe dibînin.

- Ne wisa ye hevalê Xelef, ji bo ku em di axa wan de ne, di herêma wan a rizgarkirî de ne, vê çalakiyê jî, em di bin fermandariya wan de pêk tînin.

- Ez bi xwe vê biryarê qebûl nakim. Tu berjewandiya me jî di vê çalakiyê de nîne. Em dixwazin ku li ber dilê hina şêrîn bikin, lê ev yek hêviyeke vala ye. Ez dibêjim ku, em dev ji vê çalakiya bêxêr berdin.

Selîm bi hers gote Xelef: "tu wan gotinan çawa tînî ser ziman? em dixwazin ku başûrê Kurdistanê weke başûrê Wîetnamê bikin, ku başûrê Wîetnamê di şoreşa Wîetnamê de rola girîng lîstiye, başûrê Kurdistanê jî ez dibêjim ku, dê roleke wisa bilêyîze."

- Em, li Bakur şerê xwe yê gerîla û rêxistinê xurt bikin hê çêtir e. Alîkariya me ya mezin ji gelê me yê başûrê welêt re bi wî rengî hê zêdetir dibe. Li Bakur bizava azadiyê pêşxistin alîkariya herî mezin a ji bo gelê me yê Başûr e.

Piştî nîqaşên Xelef û Selîm, Bênav heqê axaftine xwest, rabû ser piyan, dest bi nirxandina xwe kir: "kurt kurmancî, ez bi xwe tevlê nirxandinên hevalê Xelef dibim. Vêkra çalakî derxistin pêwîst nake. Pêwîst nake ku em hêzên xwe li Başûrê welat qels bixin, telef bikin. Em bi her rengî li Bakur xebata xwe ya azadiyê pêşxin hîna çêtir e, gora min."

Piraniya hevalên ku beşdarî civînê bûne, nirxandinên hevalê Xelef û Bênav parve kirin. Heta di civînê de nîqaşên pir tund derketin holê. Nîqaşên weke Selîm zilamê Partiya Demokrat bi navkirin jî derketin holê.

Lê, dawiya civînê Selîm bi ya xwe kir, heval rêkirin kifşa cihê ku çalakî pêk were.

Fermandarê pêşmergeyan Eliyê Qado bû, siyasî û sê pêşmergeyên dîtir jî li cem wan bûn. Ji hevalan jî yên ku ji bo kifşê hatine şandin; Xelef, Delîl û Azîme bûn.

Kifşa yekîneya Sedamê dîktator; Eliyê Qado û pêşmergeyên giredayî wî pêk anîn.

Bênav ew çend rojên ku ji Xelef û Delîl cuda, pir bêhn teng dibû. Lê wexta ku Evîn didît, bêhna wî derdiket, qet nedixwest ku ji cem Evînê rabe, dixwest ku her li cem wê rûne û bi wê re biaxife.

Hestên her duyan her roj ku derbas dibûn li hemberî hev hîna zêdetir gêş dibûn. Hestên her duyan li hemberî hev hatin asteke wisa ku, her dixwastin ku her kêliyekê hev bibînin. Bi hev re rûnîn, biaxifin, lê nedikarîn pêk bînin, ne dikarîn biçin cem hev, ne jî dikarîn dûrê hev bisekinin. Ji bo, kifşa tofê nav serê çiyayê Xantûre du qolên kifşe hatin bi rê kirin. Qolek ji pêşmergeyên Partiya Demokrat, qolek jî ji hevalan, qolê pêşmergeyên Partiya Demokrat pênç pêşmerge bûn. Li ser qolê wan Eliyê Qado, li gel wî pêşmergeyê qedîm Siyasî û sê pêşmergeyên dîtir, ji hevalan jî Xelef, Azîme, Bênav û Evîn bû.

Di meşe de pêşmergeyan li pêşiya qolê meşê, hevalan jî, li dû wan rêz wergirtin û meşiyan. Eliyê Qado li pêşiya wan de bû. Ango, di nava pêşmergeyan de, yê şareza Eliyê Qado bû. Li dawî jî heval Azîme cihê xwe wergirtibû. Li pêşiya hevalan jî, hevalê Xelef cihê xwe girtibû. Cihê Evîne jî li dû Bênav bû. Evîn û Bênav ji kêfa dilên xwe difiriyan.

Bênav û Evîn, dihizirîn ku rewşa wan, tu heval pê nehesîne. Lê hemû hevalên ku li nig wan halê wan dizanîn. Lê, ew qet xiçil nedikirin, qet weke bi hestên wan nehesiyanê tevdigeriyan. Ew pê nehesandine.

Nêzî, cihê yekîneya leşkerî, Eliyê Qado, kek Siyasî û pêşmergeyek ji bo xwarînê rê kir gundekî, ev peywir ne bi dilê kek Siyasî bû, lê ji bo ku, ev destûra fermandarê wî bû dilê wî nehêla, bi ser peywira xwe de çû, kek Siyasî.

Eliyê Qado, heval li cihekî durî tofa leşkeriyê dijmin hiştin. Hevalan bi çavên serê xwe jî tofa leşkerî nedîtin.

Piştî kifşê herdû qolên kifşê zivirîn baregeha xwe. Biryareke hevbeş wergirtin ku; di şeş qolan de erîşê bibin ser yekîneya leşkerî ya Sedam. Du qol ji hevalan, çar qol jî ji pêşmergeyan hatin amadekirin. Ji baregehê dîsa berê xwe dan cihê ku tofa dijmin lê.

Qolê hevalan ê kifşê, di meşê de rêza xwe weke berê wergirtin. Dîsa dimeşê de Evîn li paş Bênav bû. Her dû jî ji kêfa dilê xwe weke bifirin dimeşiyan. Navbera navserê çiyayê Xantûr li wan weke firek av vexwin hat, weke kêliyekê li wan hat. Cara yekemîn derfet bi dest wan ketibû ku tevli çalakiyeke çekdarî bibin. Loma kel kela dilê wan bû.

Eliyê Qado, nêzî cihê çalakiyê, dîsa Siyasî şand xwerîş ê. Siyasî vê carê hîna pir bi hêrs bû, xwe li Eliyê Qado rakêşa, gote Eliyê Qado: "ma qey tu min kal dihesibînî, tu min her carê rê dikî xwarîşê, çekê giran her tim ez radihêjime, eger ez vê çekê giran li vê çalakiyê neşixulînim, careka din min ev çek neavêt milên xwe. Pêwîst e di vê çalakiyê de ez çend leşkerên dijmin bêmerêz bikim."

Eliyê Qado pir li ber Siyasî geriya, li dawî wî jî daxwazên Eliyê Qado qebûl kirin. Bi ser karê xwe de çû.

Kek Siyasî û hevalê wî, çûn ji gund têra hêza ku erîşê pêk bîne, xwarîn wergirtin anîn navsera çiyayê Xantûrê. Lê li cihê çalakî pêk bê kes nedîtin.

Li nav serê çiyayê Xantûr, bi lez berê xwe dan baregehê, lê li nîveke rê gîhiştin hevalên xwe.

Kek Siyasî pir ji Eliyê Qado hez dikir, Eliyê Qado jî ji wî pir hez dikir. Ji ber vê yekê, Eliyê Qado kek Siyasî rê nedikir cihên ku, talûke lê heyî. Kek Siyasî dixwest ku her li gel Eliyê Qado pêşmergetiyê bike.

Wexta ku kek Siyasî gîhişt Eliyê Qado,dest bi henekan kir, gote Elî: "ez têgîhiştim ku, te çima ev erîş pêk ne anî? wexta ku min ew pengavên metir û metir nîveke di rê de dît, min zanî ku, ev gavên mezin gavên te ne?"

Eliyê Qado jî bêaxaftin, bi ken bersiv dida Siyasî, Siyasî çiqas henek bi wî re dikirin jî, Elî jî serê xwe ber bi wî dikir dikeniya.

Eliyê Qado pêşmêrgeyekî pir kevn bû, li başûrê welêt bi pêşmêrgeyên wisa re dibêjin; pêşmêrgeyên qedîm. Eliyê Qado, pêşmergeyekî pir dilnizm bû. Naye zanîn ku, ji xizantiyê yan jî ji dilnizmiya wî ye, her demsaleke salê, pêlaveke qîr di lingê wî de bûn, kincên wî jî her kincên kevn bûn. Kincên nû, tu caran kesî nedîtî bû, Elî li xwe kiribûn.

Di rê de, hevalê Xelef ji Eliyê Qado pirsî: "kek Elî çima me çalakî pêk neanî?"

- Heval me ax biavêtiya hewayê ji leşkerên dijmin li erdê nediket. Ji ber vê yekê me biryara çalakî pêk neanînê wergirt, em hêza xwe paşve vedikêşin.

Kek Siyasî dîsa dest bi henekên xwe kir, gote Eliyê Qado, "bavêje!..mamo bavêje!..dinê fireh e…"

Eliyê Qado li Siyasî zivirand: "çi avêtin kek Siyasî, her derek mişt leşker bû."

- Ez têdigîhijim Elî, naxwe leşker li wê derê hebûn, got Siyasî.

Heval Xelef gora dilê xwe ji Eliyê Qado bersiv wernegirt. Lê pêwîst nedît ku, hîna der barê çalakiyê de, hê jî pirsên din bike. Lê henekên kek Siyasî di mejiyê hevalê Xelef de hin pirsên balkêş peyda kirin. Ji ber ku, ji cihê çalakiyê paş de vekêşana wan pir balkêş bû. Ev vekêşana vekêşaneke asayî bû.

Hevalê Xelef li baregehê, wateyê henekên Siyasî yên bi Eliyê Qado dikirin ji Siyasî pirsî.

Kek Siyasî gote Xelef: "heval hin fermandarê me yên payebilind, bi Sedamê xwînxwar re di tekîliyê de ne. Ew hin qereqolê xwe vala dikin, bi agahiyên me vala dikin. Xeber didine hin fermanderên me, dibêjin me filan filan cihê xwe vala kir, em jî diçin êrîşe wî cihê vala dikin, piştî vê yekê jî, em propaxandayê dikin, dibêjin me filan yekîniya dijmin wêran kir. Ev yek ne biryara Eliyê Qado ye, bîryara hin rêvebir û fermandarên me yên paye bilind in."

- Sax bî, kek Siyasî....

- Bi min re nebêje kek Siyasî bibêje heval, ji ber ku ez jî heval im.



ROJEV
23 Mijdar 2009 Hejmar: 11 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Ji bo kalê 91 salî spor esas e

Li Çînê kesê bi navê Zaw Kualîc ku 91 saliye dibêje ku ji temenê xwe yê ciwantiyê dest bi sporê kiriye û heta niha spor ji wî esasa herî girîng bûye. Kualîc got qet xwe ji sporê dûr nexistiye. Welatiyê çînî Kualîc niha 91 saliye û gelek aktîf e. Kualîc anî ziman ku hêza xwe parastiye û xwe wekî ciwanekî 19 salî dibîne. Zaw Kualîc ji 27 saliya xwe ve ye sporê dike dike. Kualîc bilêv kir ku her cureyên xwarinê naxwe û got ku ji bo ku zirarê nede laşê xwe baldar e. **PEKÎN**



# Li Rihayê demsala şerê kevokan dest pê kir

**Bernameya Kevokan a çûkbazan ku li Rihayê her sal di meha mijdarê de dest pê dike heta meha nîsanê didome. Çûkbaz li hev kom dibin û ji bo pêşbirka şer kevokan difirînin asoyên şîn**





Li Rihayê 'Bernameya Kevokan" a çûkbazan li Taxa Sirrinê bi firantina kevokên şerûd dest pê kir. Bernameya firandina kevokan ku her sal di meha mijdarê de dest pê dike heta meha nîsanê didome. Her sal di meha mijdarê de li Rihayê bi dehan çûkbaz, di çarçoveya "Bernameya Kevokan" de li hev kom dibin û ji bo pêşbirka şer, kevokan difirînin asoyê şîn.

Kevokên ku di jiyan û çanda mirovahiyê de remza aştiyê tê nasîn, li Rihayê li dijî vê remzê, di nava gel de wekî remza şer tê zanîn. Nêzî 500 çûkbazên ku li taxên Haşimiyê, Eyyubiye, Yakubiye û Suleymaniyê, ji bo zewq û keyfa xwe kevokan di malên xwe de kedî dikin. Çûkbazên ku kevokên xwe yên şer di malê de xwedî dikin û perwerde dikin, bazin, mircan û guharên rengîn dixemilînin. Bi mehan li ber baniyan difirînin û perwerde dikin. Piştî demsala payizê meha mijdarê çûkbaz li hev kom dibin û bernameya pêşbirka şer li dar dixin.

**'Ev kevneşopî 4 sal in didome'**

Îsal jî, ji bo 'Bernameya Kevokan" çûkbaz li Taxa Sirrin gîhiştin hev û dest bi firandina kevokan kirin. Çûkbazên ku piştî 6 mehan kevokên xwe yên şer li malê bi taybetî xwedî kirin û perwerde kirin beşdarî pêşbaziya şerê kevokan bûn. Endamê Komeleya Çûkbazan Mehmet Eskîler, diyar kir ku çanda xwedîkirina kevokan ji bav û kalan tê û wiha got: "Ji bo xwedîkirina kevokan hezkirin û meraq lazim e. Ez niha refê ku ji 250 kevokên nêr pêk tê xwedî dikim. 6 hep jî kevokên mê ne. Ên herî bi qîmet kevokên Zeytunî, Taklevan Îspîr Bagdadî û Belek in. Buhayê wan ji 300 milyonî dest pê dike û zêde dibin. Çend roj berê kevokekî teqlevan min bi 800 milyonî firot. Ji bo her refekê kevokek pêşeng heye. Piştî refê kevokan difirin û bi saetan li hewa dimînin tên hemberî hev û dikevin nava hev. Şerê wan şerê hebûn û tunebûnê ye. "

Çûkbaz diyar dikin ku nêzî 500 kes çûkan bi taybetî xwedî dikin û her kesek herî kêm refê ku ji 200 kevokên nêr pêk dê xwedî dike. Çûkbazên ku her roj li Bazara Etaran digihêjin hev, îsal dê bernameya pêşbirka şer saet di 16.30'an de kevokan firirînin ezman. Endamê Komeleyê Halîl Karademîr, anî ziman ku her roj bi hezaran kevok di saet 16.30"an de li ezman digihêjin hev û şerê kevokan dest pê dike. Karademîr, diyar kir ku her kes ji ser banê xwe refên kevokên xwe difirin û piştî saetan li ezman difikirin piştî saeta êvarî ref tên hemberî hev û şerê wan dest pê dike. **RIHA (DÎHA)**

## Tîmên futbolê navên kurdî dixwazin

Pêvajoyên 'nîqaşên çareseriya pirsgirêka kurd' li qada futbolê jî xwe da der. Piştî Dersimsporê niha jî li Amedê jî tîmên amator navên xwe guhertin. Ewil Amedspor, piştre Pasurspor navê kevn ê bajarên xwe hilgirtin ser xwe. Ev nav ji aliyê FFT'ê ve jî hatin qebûlkirin.

Rêveberê Amedsporê Mehmet Emîn Yîlmaz der barê mijarê de axivî û wiha got: "Em bi armanca sazkirina biratî û dostaniyê ku derdorên sporê ji vê yekê bêpar in, di vê pêvajoya demokratîk de hatin damezrandin. Di despêkê de saziyên fermî ji me re gotin di ferhenga TDK (saziya zimanê tirkî) de navê Amed tune ye. Lê em baş dizanin ku Amed bajarekî kurd û metropol e. Hemû kurdên li Tirkiyeyê dijîn Diyarbakirê wek Amed dizanin. Kesk û sora di formayên me de sembola Diyarbakirê ye. Zera me jî ji tavê ku em her tim dibînin tê û sembola ronahî û aştiyê ye.17 stêrkên di logoyê de navçeyên me ne. Tav kîşwera me ya germ û darberû jî ew dar e ku li heremê herî zêde digihe. Damezrandina Amedsporê nîşana gelek serkeftinan e. Diyarbekirspor jî yek ji tîmên me yên herêmê ye." **AMED**

## Ji bo ekîbên Serwîsa Lezgin kurs

Rêvebiriya Tenduristiyê ya Bajêr a Rihayê, ji bo peywirdarên serwîsa bi lez a 112, perwedeya teknîkên ajokariyê da destpêkirin.

Rêveberiya Tenduristiyê, ji aliyê Rêvebiriya Şaxa Xizmetên Tenduristiyên dema Afetan û servîsa bi lez a 112, bi piştgiriya Komeleya Paramedîk bo wezîfedarên servîsa bi lez a 112 "Perwerdeya di Ambulansan de Teknîkên Ajotina Ewleyî" dan.

Perwerde li balefirgeha kevn a Rihayê hate dîtin û ajokarên servîsa bi lez a 112, perwerdeya ewleyiya nexweşbirinê û di dema panîkê de bi awayek ewle ajotina wesayîtê fêr bûn. Arîkarê Birêvebirê Tenduristiya Bajêr ê Rihayê Sait Koyuncu, 8 ajokarên ku di servîsa 112 de erkdar in, 5 paramedîk û 8 teknîsyenên tipê yên acîl tevli bûn. RIHA *(Aknews)*

## Li bikaranîna gaza xwezayî baldar bin

Serokê Daîreya Îtfaiyeyê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Hakki Bilîcî li ser girîngiya bikaranîna gaza xwezayî sekinî û anî ziman ku ji sala borî de li Amedê gaza xwezayî tê bikaranîn.

Bîlîcî der barê bikaranîna gaza xwezayî de gel hişyar kir û got ku bila baldariyek li ser hebe. Bîlîcî wiha dirêjî da axaftina xwe:

"Wekî ku tê zanîn ji sala borî de gaza xwezayî hate bajarê me Amedê. Pergala gaza xwezayî divê di qadên biçûk ên wekî 8 $m^3$ de neyên bicihkirin. Ji bo bicihkirina van cîhazan divê herî kêm 150 $cm^2$ riyên hewayê hebin. Ev riyanan jî divê qet neyên girtin. Cihê ku kombî lê hatiye bicihkirin jî divê teqez mirov lê ranezin.

Kombiyên gaza xwezayî divê li cihê girtî yên wekî serşo û tuwaletan neyên bicihkirin. Kombî divê li nêzî şaneşînan bê bicihkirin. Yanî cihên ku hewayê digirin."

**'Bila fîrma paqij bikin'**

Bîlîcî bilêv kir ku divê boriyên tesîsata hundir ya gaza xwezayî jî bê parastin û wiha got: "Boriyên hundir ên tesîsatê divê jengê negire. Eger ku borî jengê bigirin rîska qaçaxa gazê zêde dike. Her wiha amûrên kombiyê yên ku kevn bûne jî divê teqez bên guhertin. Ev jî divê sertîfîkayên Diyargazê bên guhertin."

Bîlîcî di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Eger ku rojin neyên paqijkirin, an jî ji aliyê kesên ku nizanin ve bê paqijkirin, rê li xetereyan vedike. Mînak divê rojinên gaza xwezayî salê carekê, rojinên normal salê du caran, yên nanpêj, lokante û fabrîkayen jî 15 rojan carê bêne paqijkirin. Ev jî divê ji aliyê fîrmayên bi ehliyet û Serokatiya Daîreya Îtfaiyeyê ve bên paqijkirin." **AMED**



## Keça wê niha 3 salî ye

Jina bi navê Adrîana Îlîescu (70) di 66 saliya xwe de zarokek anî dinê û hemû cîhan ji ber vê bûyerê matmayî mabû. Îlîescu ji Romanyayê ye û mamosteya zanîngehê ye. Îlîescu diyar kir ku her tim xwestiye ku zarokek wê hebe û herî dawî ev daxwaza xwe aniye cih. Niha keça wê 3 saliye. Îlîescu got ku ji ber temenê xwe di dema ducaniyê de zehmetiyên mezin kişandiye.

Lê ligel hemû zor û zehmetiyan bebikek ku tenduristiya wê gelek baş bû anî dinê. Lê ji ber ku di temenê xwe yê mezin de zarok anî dinê, hem li welatê xwe û hem jî li cîhanê rastî rexneyan hatibû. Îlîescu der barê mijarê de wiha dibêje:

"Li cîhanê ji bilî keça min tu kesê min tuneye. Hefteya borî min rojbûna xwe pîroz kir. Ez ketim 70 saliya xwe. Min bi keça xwe re rojbûna xwe pîroz kir. Kesên ku me dibînin, ji min re dibêjin ev neviya te ye. Ez ji vê rewşê ne razî me. Dibe ku temenê min zêde be lê tenduristiya min gelek baş e. Heta ku keça min nebe 20 salî ez dê wê tenê nehêlim. Keça min niha 3 saliye. Wêneyên gelek xweşik çêdike. Dikare reqeman bijmire. **BUKREŞ**



## Cîhan di gerdûnê de tenê noqteyek e

Cîhana me ya bi mirovan bê dawî xuya dike di kosmosê de belkî ne dilopek av e jî.

Bi milyaran galaksiyên li kosmosê û bi milyaran stêrkên ku tenê galaksiyekê çêdikin jî deynin aliyekî gava dinya me bi roj û 9 gestêrkên (gezegen) galaksiyekê ve bê rûbirûkirin aşkere dibe ku ew di mekaneke bêserûbinî de nuqitek e.

Belê dinya me bi rastî jî ji texmînan gelek biçûktir e. Zanyar diyar dikin ku gerdûn (kosmos) ji milyaran galaksiyan pêk tê. Di her galaksiyekê de jî bi milyaran stêrk û cismên mezin ên wek rojê hene.

Di bêtirîn galaksiya mezin de li dorî 3 trîlyon stêrk hene. Di galaksiyeke normal de 200-300 milyar û di galaksiyeke biçûk de jî li dorî 100 milyar stêrk hene. *(hawarnet)*

www.arsivakurdi.org